



Danerê Rojnameya pêşî ya  
Kurdî Miqdad Mithed Bedirxan

# Armanc

Hejmar, No: 149


Gulan

May 1994

Buha - Price

15 SKR, 4 DM

## Rojnameya Mehane



### Nameya Celal Talabanî bo Mesûd Barzanî

"Ji destpêka karesatê min rê da cenabê te, ku li ser navê me herduyan (ez û tu) desthelatan bi kar bînî û herdu polîtburoyan ji bo kontrolkirina rewşê li hev bicivînî... Em hemî dilxwes bûn bi vê ku reng e êdî şer raweste, lê mixabin hema nêzîkî baregehêne te, qesabiya ku hêzên we, pêşmergeyên Selahedîn çêkir û êrîşî ser Mele Omer kir û Rêbaz jî bi wî awayî hatiye kuştin ku bêgûman te bi xwe jî bihîstiye..."

Her çawa be, em careke din jî li hevhatinekê bi amadebûna Kongreya Niştimanî ya İraqî Yekgirtî nû kir. Lê vê carê İran, Tevgîra İslâmî, Partiya Xwedê (Hizbullah) û pasdar jî ketin nav û çend deveran de şer çêbûn û

bi vî awayî qesabxana bo qefle Hesen Kustanî çêkirin.

Ez vê nameyê ji bo bîranîn dînîsim û min hez dikir ku di roja yekem de ez li Kurdistanê bûma, da ku me bi alykariya we şareyekê bingehî ji bo vê problemê peyda bîkira, lê ne di reya erdê bi wasîta we ve tatmîn nebû, da ku di dema pêwîst de bêm cem we. Lewra jî berpirsiyârî dikeve ser cenabê we. Yek tu tam di nav cergê van bûyeran de yî, ya din ez li Kurdistanê nebûm û min wekaleta xwe da te ku li ser navê me herduyan çareya vê rûdanê bikî.

Niha jî ji bo cara sêyemîn jî li hevhatinekê îmze kirine, lê wekî ku ez dibihîsim dîsa li Hewlîrê çend bûyer çêbûne, her weha li Çiyayê Sor, Şarezor û li sînorêne Qaledizê û Hecî Omranê şer û şerfirotin û hereket hene, ev bûyeran jî bêgûman li dijî canê lihevhatîne ne û ji bo pêbaweriya Kurd nexweş e ku sê caran lihevhatina rawestandina şer ji bo aştiyê bê ìmzekerin, lê disan jî şer çêbibin.

Ez tika dikim ku bi kurtî, min jî dîtin û raya cenabê we û hevalê te, di derheqa reya piraktik ya rawestandina şerî û wergerandina aştiyê ji bo Kurdistanê û normalkirina peywendiya navbera Yekîtiyê û Partiyê, agahdar bike, da ku ez jî li gora wî bi heval û dostêne xwe re bipeyivim."

25. 05.1994



### Banga Mesûd Barzanî

Bi navê Xwedayê mezin û mîhrîban Gelî xelkê bi şeref yê Kurdistanê, Pêşmergêne egit, Xwişk û birayêne xweşdivî.

Ji destpêka vê mehê welat û milletê me rastî belayek bi xwîn û şerekî birakujiyê pir mezin û ne rewa bûye. Ev karesat (belaboblat) û fitneya çarenivîs û pêşeroj û destkeftiyen pîroz yên gelê me ku bi xwîna hezaran şehîdan û lawêne egit yên gelê Kurdistanê hatine bi destxistin, dike nav bîvetî (talûkê) û metirsîyeke pir mezin. Ez di vê qonaxa dîrokî û mesîri de daxwazê ji her aliyeke kesen şerxwaz dikim ku şerî rawestinîn û êdî xwîna kurên Kurdan bi dest Kurdan nerijinin. Divê rawestandina şerî giştî û seranseri be ji bo ku em digel Kongreya Niştimanî ya İraqî û bi hevkariya hemû xêrxwazan bikarîn rewşê weke rewşa normal ya caran lê bikin û rojekê zûtir dest bi dermankirina birînên xwe bikin. Di gel gazîyên min yên berî vê ez, zamîr û wijdanê her aliyeke ji we dikim, hakim û ji we re bi xwîna şehîden Kurd û Kurdistanê sondê dixwim ku ez li gor vê gaziya xwe reftar bikim û wê bi cih bînim. Her çend di rûyê me de nayê em qala cejna qurbanê bikin lê hêvidar im hûn cejneke aram û rihet derbas bikin.

Mesûd Barzanî

Demjîmîr 23.30  
19.05.1994

## Ma heta kengî Kak Mesûd û Mam Celal ?!

■ Li gor nûçeyên ku ji herêmê tê, herdu hêz ji hev gelek kes kuştine û di nav van kesen kuştî de berpirsiyârîn herdu rêxistinan yên hin herêman jî hene.

■ YEKBUN, RNK, TSK:  
"Em hersê rêxistin, careka din gazi serokatiya PDK-Y û YNK dîkin û ji wan daxwaz dîkin ku vî

"Şerê Birakujiyê" yekser rawestinîn. Ji bo rawestandina vî "Şerê Birakujiyê", bê guman vatînî û berpirsiyârîya herî mezin li ser milê serokatiya PDK-Y û YNK'ê ye"

Di destpêka meha Gulanê de, li Kurdistanâ Başûr, di navbera du hêzîn mezin ku hukûmeta herêma Kurdistanê avakirine de şer birakuji dest pê kir û heta rojname me ket çapê jî ev şer di navbera Partiya Demokrat a Kurdistanê-Yekgirtin û Yekîtiyâ Niş-

timanî Kurdistanê (Yekîti) de cî bi cî dom dikir.

Herçiqas sebebê vî şerê birakuji li Qaledizê li ser problemeke erd di navbera Partî û Yekîti de rûdaye jî, firehbûna şer vê sebabâ ku tê diyarkirin pûc dike. Şerî di navbera herdu hêzan de işareta parvekîna xaka rizgarkirî dide. Yekîti dixwaze li herêmê Soran rola Partiyê kêm bibe, Partî jî dixwaze li Behdînan rola Yekîtiyê kêm bibe. Lî ev hesabîn wan yên piçûk, qoz dide desîtê dewletên cîran ku ew planan çêkin daku dewleta federe ya Kur-

distanê hilweşînin.

Li gor nûçeyên ku ji herêmê tê li gor beyanên serokên hêzîn ku bi hev re şer dikin; herdu hêz ji hev gelek kesen kuştî de berpirsiyârîn herdu rêxistinan yên hin herêman jî hene.

Ji bona ku ev şerê birakujiyê di navbera Partî û Yekîtiyê de bê rawestandin ji alyî hêzîn Kurdistanê ve komite hatin avakirin. Xelkê Kurd ûmze civandin. Hêzîn Kurd beyan derxistin.

Hemû rêxistin û partîyên Kurdistanâ Bakur şerê Kurdistanâ Başûr wek şerekî birakuji dibînîn

û diyar dîkin ku sebeb ci dibe bîla bibe, pêwîst e ev şer bê rawestandin.

Lê ci heyf PKK di vî şerî de teref digre û tenê PDK'ê gunehkar dike.

Komiteya Hevkariya Hêzîn Siyasi yê Kurd û Kurdistanâ li Swêdê (ji 4 perçen Kurdistanâ 14 rêxistin û partî cî digrin) di 12'ê Gulanê de nameyek ji Hukûmeta Herêma Kurdistanê re şand, ji bo şerê birakuji nerazîbûna xwe

Dâmahîk. r:11

## Ax halê me Kurdan!

Lewend Firat

hemûyan be!" Û xwedigiravî yek dibêje navê min Yekîti ye û yê din jî dibêje navê min Yekgirtin e.

Careke din "baweriya" ku di destê dijminen Kurdistan de ji bo idarekirina Kurdan bûbû gotina "beraqil" û bêbaweriya xwe idarekirinê di nav Kurdan de belav kiribû, ji nû ve aktuel bû. "Kurd divê her tim eskeren xelkê bin"

Ji alyî din ev şerê wan nîşan dide ku parlamento û hukûmeta ku wan ava kiribûn, tiştekî formel

bû. Ger wiha nebûna herdu serok ku nakekî parlamentojê jî wê rûmetâ vê organa bilind bigirtana û şerênavxe di tawilê de bidana sekinandin.

Lê wan bi ya Tirkîyê Kir. Tirkîyê wan li hev anî. Lî yê ku kare wan li hev bîne, kare wan berahev jî bide.

Kî ci dibêje bila bibêje vî şerî di dilê Kurdan de birîneke mezin vekiriye û xeteriyeke mezin bi xwe re tîne. Ew hesabîn piçûk yên herdu hêzîn ku xwîna hev dirjînîn, îmkanîn jiortêrakirina xaka rizgarkirî dide dewleten dora xwe.

Ew starâ ku Kurdan bi alîkariya xelkê biyanî avakirine içar ew bi destê xwe ji ortê radi-kin.

Ma ev ne gunehkarî ye!

Kurdîn başûr wexta digotin; di rewşa xwe ya herî xerab de, wexta xîbîra (murekeba) me tunebû û li welatê me tradisyonâ demokrasiyê tunebû, me li ser axa xwe ya rizgarkirî hilbijartîneke herî demokratik pêkanî, ji komûnistan heta dîndaran hemû parti û rêxistin bi azadî ketin hilbijartîn û bi vî hawî me dersa demokrasiyê da welatên Rojhilatê Navîn, em hemû Kurd pê serbilind dibûn.

Bi rastî jî me hemû Kurdan bawer kiribû ku pişî evqas felakatan edî birayêne me yê başûr birç bin, tazî bin, tâhma azadî û demokrasiyê girtine, tu hêz û quwet nikare wan ji vê tâhmê bêpar bîhîlin. Herdu rêxistinîn mezin bi awakî qenc û demokratik têkoşîn didan. Atmosfera ku di dema hilbijartîn

û pişî hilbijartînê de di navbera herdu hêzîn gewre de çebibû ev tiş nîşan dida û te digot qey, ew dijminatiya bi salan hatiye ji bîr kirin. Kak Mesûd û Mam Celal edî li ser qedera welatê xwe yê azad xwediyên gotinek rasteqin bûn.

Lê ev serbilindî û këfxweşî û daxwazîn ku me ji wan hêvî dîkin, du salan ajot. Ew hilbijartîna demokratik, ew meclîsa plûralîst û ew dewleta federe bi destê wan hêzîn ku me hêvî ji wan dikirin hat herimandin û xwîna birakujiyê ew dezgehêne bi rûmet, dan ber lehiyên xwe.

Nêzî mehekê ye di navbera du raqibîn kevn de şerê birakujiyê dest pê kiriye, Mam Celal li derveyî welêt e, Kak Mesûd jî beyan li ser beyanê derdixe da ku şer rawestîne; lê ci feyde! ne şer dise-

Rojeva Mehê

M. Eli

## Sedemên şerê Kurdistana Îraqê

Tırsa ku bi salane dilê her Kurdeki dilerizand dawiya dawî bi şerê me de kumişî bû xebera nexêrê a şerê navbera herdu partiyê esasîn ên Kurdistana Îraqê wekî bombeyekê di navbera me da teqîya bû. Ji vî alî u wî alî de dihat gotin ku şerekî mezîn di navbera PDK ê YNK ê de derketiye, bi hezaran kuşî hene, terefan êris birine ser meqerîn hevdû, her yek li herêmên xwe dest danîne ser hêzên terefê din û hwî. Lî bi vê bûyera ne bixêr careka din wê xususiyeta me ya Kurdbûnê rû dabû. Xeberen ku belav dibin ji çavkanî û delilan bêparbûn şayîa bûn, li hev nedikirin, bûyer mezin dikirin. Lî sebebê rastîn yê bûyerê û rewşa rastîn a wê nîşan nedidan. Vê yekê meraq û tırsa dilê her Kurdeki zêdetir dikir.

Bi halê ruhiyetaka wiha carekê ez rastî hin Kurdekin dost ên Behdinî hatim bi hêviya ku belkî rastiyê, sebebê bûyerê ji wan bibhîzim. Min pîrsî ku ev ci bûyer e, sebebê wê çiye, şer çima derketiye. Ewan dostan bêyi ku ji min re behsa vê bûyerê û sebebê wê yên berbiçav bikin, hema gotin: Ma tu Celaliyan neniyasî, ma tu nîzanî C. Telebanî çawan e? Ji dîlva ku ew ji min re behsa sedemê bûyerê bikin wan dûr û dirêj behsa "tarîxa qirêj a Celaliyan kirin. Di netîcî de ez gihaştım wê qenêtê ku dostê min hay ji sedem û çarçewa bûyara iroyîn nebûn

lê mewqîfê wan gelek zelal bû ew di vê meselê de li hemberi Celaliyan bûn bi "Mala Barzanî" re bûn. Min û wan dostan tiştek nexist serê hevûdin.

Pişti çendekî ez rastî Kurdeki dost êji Silêmaniye hatim ku berê di siyasetê de aktif bû û wekî Kurdeki bîrbîr dihat nasîn. Bi hêviya agahdariyekê min her ew pîrsî ji wî ji kir ku şer ji bo ci li ser ci derketiye. Ew ji yekser bersiva min da got: "çawa ji bo ci derketiye." Ma tu "mala Barzaniyan" neniyasî, ma tarîxa Barzaniyan ji bîr kiriye. Min xwest ez bêjîm "erê birader, min tarîxa mala Barzaniyan ji bîr nekiriye, ez dixwazim careke sehm bikim bê ka ev şer ji ci sebebî, bi destê kê dest pê kiriye, bûyerê bixwe çawa rûdaye" wî biraderî axafdtina min di devê min de birî û dest pêkir navê Mele Ewar Süleyman Muîni û Dr. Şivanî li pey hev rîz kir. Min dît ku ez û ew ji em çu tişti naxin serê hev du.

Gava ez û ew em ji hev bi dûrketin herdu bersiv bi hev re di mejiyê min de li hev ketin û bersiva rastîn a vî şerî dûmâhîkê wekî birûskekê di mejiyê min de ronahî veda. Naxwe sebebê esasî yê vî şerî pirsa min û bersiva van herdu terefan bû. Xwiya bû li Qeledizê şerek li ser erseyeke derketibû, li Kurdistana Iraqê li her bayer û gundî kê pîrsiyar kiribû ji yekî re gotibû "ma tu mala Barzaniyan ne niyasî" ji yên din re ji gotibû "ma tu Celaliyan neniyasî" xwiyyaye ev bersiv ji bo her yekî bes bû ku rake çekê xwe û êrisê bibe ser yên din û ev şer wele berfireh bûbû.

Heke ez di vê tespîta xwe de rast bim, naxwe sedemên vê bûyerê gelek kûr vedayî ne di avayiya civakê de. Mana xwe şuûra me ya ferdi û ya civakî ji ya milletbûnê gelekî dûr e, erê bi devê xwe û bi pêşandana xwe em radibin rûdînêna başa milletbûnê dîkin lê di ruhê me de û di hevîrê kultur û manawciyeta me de havêne û irada ku milletbûn dide ferdî civaka xwe nîne, yan ji bê tesir e. Ji dîlva wê ve ruhiyet û manewiyeta eşîrtî di hundîrê me de zincîr kiriye bi her bûyereke piçûk ji wekî bûnelerzîyekê zincîran dikeşîne û ci bi ber keve dihedimîne.

Îrada ku milletbûn dide her ferdekî civaka xwe hebûya, tu caran reqabeta siyasi ya navbera hêzên Kurdistana Iraqê nedîsiya ji pevçûnkekê li ser eraseyekê derketa, rengekî çekdarî û berfirehiyeka seranseri welêt bigirtiya ber xwe. Çimkî em dev ji tarîxa dûrûdirêj a bindestî û perîşanîyê berdin aweretiya 3 milyon Kurdan a çar sal berê û xetera Seddam û dijminen nuha yên çar alî ji bîr nedibûn.

Vî şerî han û neticeyên wê tiştekî din ji diyarkirin ku ew ji bi xurtî bi sedemên jorîn ve girêdayî ye. Erê ev sê sal in ku li Kurdistana başa dewleteke federe tê kirin lê ji rojan pêşîn û heta iro gelek gavinî hûrik ber bi dewletbûnêka esasî ve hatine avêtin. Dezgehêن civakî, idarî, edlî, siyasi û leşkerî yên ku li Kurdistana hene di vî şerî de xwe dezgehên dewleteka modern nîşan nedane û şer di çarçewa wê ya destpêkî de mahdud nekirie li ber pêla mejiyê eşîrtî pûç bûne bê inşiyatîf mane, heta li ber bahê wê hilweşiyane. Naxwe divê em baş lê vegerin û tespît bikin ku di van salan de ci hatine kirin ku Kurd wekî milletkî xwe bispêrinê û baweriya xwe pê bînin.

Yan ne rojê ji vê rojê tarîtir dikarin bi şerê mîletî de verin û bê dîtin ku ew dezgehêن ku me xwe pê serbilind dikirin wekî kefa ser sabûnê heliyan çûn û tu sitarî lê me nekirin.



Tahsin Taha, Şivan Perwer û Fuad Ahmed di şeva YEKBÛN'ê de (Foto: Armanc)

## Şeva 2 saliya YEKBÛN'ê

Bi munasebatê du saliya damezrandina Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê (YEKBÛN) di 13'ê Gulanê de li paytextê Swêdê li Stokholmê li Konserthusetê şeveke şahiyê hat li dar xistin. Koma Şilan ya folklorê, Tahsin Taha, Fuad Ahmed û Şivan Perwer bêşdarî şevê bûn. Zahid Brifkanî ji bi kemana xwe ya xweş mîvanen şevê kîfxwêş kir.

Li ser navê YEKBÛN'ê Mahmut Kîper di şevê de axivî. Kîper di azaftina xwe de li ser pêvajoya avakirina YEKBÛN'ê sekînî û behsa bûyeren rûdayî yê ku li Tirkîyê û Kurdistanê dibe, kir. Wî di azaftina xwe de weha got: "Ez naxwazim li vir dûr û dirêj li ser xebatên YEKBÛN'ê bisekinim û pesnê wê bidim. Eger Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê pesindayîna xwe heq kiribe, divê gelê Kurd kadro û militanen gelê Kurd vê pesnê bidin. Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê, çiqas xurt dibe bila bibe çiqas di

dewletê. Lî ji aliyê din ji van partiyân ev şasî û kîmasî nekiribana jî dewletê bixwesta wan qedexe bike. Iro Kurd disa di nava xebatek avakirina partîyeke legal de ne. Helwêsta dewletê wê li hember wan çibe ewê di rojê pêş de xuya bike. Lî daxwaza me ew e ku Kurd bi hev re bikaribin partîyeke legal avabikin û deriyê wê ji her welatparêzêkî re vekirî bîhelin. Dema ku bi hev re di nav partîyeke de sertê xebatê nemîn, divê hêzên Kurd li hember hev rîyan negirin, dijî hev bê tolerans nebin. Gelê Kurd di rewşek wusa dijwar de ye ku pêwîsiya me ji her Kurdekelî welatperwer re heye. Divê em tu kesi li derveyî vê xebatê nehêlin. Divê em tu welatperweri bi hînek iddiyêñ ku dewlet pê kîfxwêş be îtham nekin. Bila dîtina me û metodê me li ser şoresa Kurdistanê û doza wê cihê be. Ev ne qelsiyek e. Hêz û welatperweren Kurd mecbûr in di nav xwe de konsesûsek pêk bînîn."

Li ser DEP û avakirina partîyeke nuh ji Kiper wiha got: "Di qedexekirina HEP'ê û DEP'ê de gelek eşkere ye ku şasî û kîmasîyên wan e ji rol lîstîn. Wan ji gelek argument dan desten

### HADEP hat damezrandin

Di 11'ê Gulanê de bi navê Halkin Demokrasi Partisi (Partiya Gel ya Demokrasiye-HADEP) partîyeke din hat damezrandin. Serokê Partiyê sekreterê kevn yê DEP'ê Murat Bozlak e. M. Bozlak di beyana xwe ya di rojnama Medya Gunesi de diyar dike ku ferqa wan û DEP'ê tuneye, lê ew ne demama DEP'ê ne ji.

Wek tê zanîn di derheqê DEP'ê de da'we vebûye ku bê girtin. Yen ku HADEP damezrandine valahiya DEP'ê dê tije bikin û qada xebata legal vala nehêlin.

### Azadi

#### Dewletê "Azadî" girt "Dengê Azadî" derket

Pişti rawestandina rojnama Özgür Gündem'ê dewletê içar rojnama hefteyî "Azadî" ji 15 rojan da sekînandin.

Berpîrsiyariya Derveyî Welêt ya Azadî'ye bi belavokekê qerara girtina Azadî'ye protesto kir.

Pişti hefteyekê di şûna Azadî'ye de rojnameyeke din di eynî şeklê wê de bi navê "Dengê Azadî" dest bi weşana xwe kir.

**Armanc**  
Rojnama Kurdi ya mehane/Monthly Kurdish Magazine  
**Redaksiyon:** M. Eli, Hesen Mizgin, Mirza Bextiyar, Lewend Fîrat, S. Rêving, M. Lewendî, **Redaktör berpîrsiyar:** M. Eli, **Berpîrsiyarê beşê Dimîlkî:** Malmîsanij, **Berpîrsiyarê rûpelîn edebî:** Ehmed Huseynî, **Utgas av:** Kurdiska Demokratiska Arbetarunionen, **Abonetî/Prenumeration:** Abonetiya Salekê, Li Skandinaviya: 250 SKR, Maqam/Myndigheter: 450 SKR, Li Ewrûpa: 60 DM. Li derveyî Ewrûpa: 50 \$.  
**Anons/ilan:** nîv rûpel/en halvsidan 2500 SKR  
**Telefon:** 46-8-803135 **Fax:** 46-8-801825 **Postgiro:** 50 37 99-9  
**Adres:** Box: 152 16  
161 15 Bromma/Sweden

ISSN: 0348 7385

### Pîrsa Kurdi û çareserkirina İslâmî

Bi vî navî di 21 û 22'ê Gulanê de li Kolnê ji aliyê İttihad-ı İslâmîya Kurdistanê ve Konfemasek hat organizekirin. Di konferansê de Dr. Cemal Nebez li ser "Biratiya Misilmanan", Osman Aydin li ser Tevgîra Şêx Seîd, M. Şeyhnâzade li ser "Bedîluzman Seîd Nûrsî", Dr. Kemal Sido Kurdaşî li ser rewşa Kurdistanê Sovyetî axifi. Sekretê Gişî yê PîK'ê Şêx Omar Garip "Pîrsa Kurdi û Partiya İslâmîya Kurdistanê metnek şandibû konferansê".

Hemû axavitanen konferansê di axavitanen xwe de şerî de navbera hêzên Kurdistanê Başûr de ku nûdaye, rexne kiin.

# Çi bi "Kurdistana Sor" û Laçînê hat!?

Şahînê B. SOREKLÎ

Wekî diyar e, di dem û dewrana Yeketiya Sovyêtî de tadeyên mezin li beşekî Kurdên Komarên Sovyêtî bû bûn. Pirraniya Kurdan hay ji van tadeyan nebû. Partî û rôxistinê ku li ber dahola propaganda Sovyêtî radibûn dilanê jî behsa neheqiyen li Kurdên Yeketiya Komarên Sovyêtî dibûn nedikirin. Kurdên Sovyêtî bi xwe jî, yan ji tırsa girtinê, yan jî ji bo berjewendiya xwe behsa van neheqiyen nedikirin. Tenê li dû prostroyakaya Gorbaçov û jihevbelabûna Komarên Sovyêtî van bûyer û serpêhatiyan derketin meydanê.

Li dû jihevbelabûna Yeketiya Sovyêtî Komarine wê serxwebûna xwe îlankirin. Ermenistan, Azerbêycan û Gurcistan, komarên ku hejmareke ne biçûk ji Kurdan lê dijin jî bûn komarên serbixwe. Di ev dem û dewrana ezotiya nasyonalizmê de, gelo çi bi serê Kurdan van komaran hat, gelo rewşa wan cawa ye, gelo çığa piştigiri ji bo wan di nav Kurdên Kurdistanê û rôxistinê wan de bi şêweyeke ciddî heye? Gelo Kurdan li van komaran bi xwe di çi raman û tevdîrân de mijûl in, gelo bi hezran ji Kurdan li Mosko gihîstîni hev ta ci radeyê serkewti, yan binkewtî ne; û gelo haya kî bi şêweyeke rîk û pêk ji wan heye? Bersîva van pîrsan li haliyekî; gelo çi bi herêma otonom ya Laçînê, ya ku wek "Kurdistana Sor" dihat nasîn hat? Ne rojnameyeke Kurdan, lê Bûletena bi navê KURDISH LIFE, ya ku ji aliyê Navenda Lêkolînê ya Pirtûkxaneya Kurdi de li Brûklîna Nûyorkê tê weşandin di gotareke dirêj de behsa pîrsa Laçînê û trajêdiya Kurdan wir dikê. Di hejmara xwe ya dawîn de (Jîmar 9/ 94) KURDISH LIFE pîrseke gelleke ciddî derdixe holê. Heger iddiyâen di Bûletenê de hatine diyar kirin rast bin, xwebêj ew e ku piraniya Kurdan bi xwe hay ji vê pîrsê nîn e û yên haya wan jê heye jî wê pîrsê, yan vedişerin, yan jî şaso-maşo raber dîkin. KURDISH LIFE gotara xwe ya ji 11 rûpelan bi vê pîrsê dest pê dike: "ERMENISTANÊ, MA TU JÎ?" Ji bo Kurdan êş û jan ne tiştekî nû ye, dibêje KURDISH LIFE, lê dema stemkarî bi destê cîranekî kevnar be, ku bi xwe pîr ji stemkariyê kişandiye were, ew êş û jana dijwartî e. Ev trajêdiya herî dawîn di dîroka gelê Kurd de xwe bi pîrsa wan 150.000 Kurdan ve eleqedar dike, ku di navbera Nagorno , Karabax û Azaerbêycanê de bi cîh bû bûn. "Wekî diyar e, dema ev devera di dest Azeriyan de bû ji nişka ve behsa Laçîn û Kurdistana Sor bû. Dema Ermeniyan xwe ji bo êrişâ li dij Azeriyan amade dikirin, "heta Kurdine berdevk hatin bi nav kirin û Ermeniyan gotin, ku herêmeke otonom ji bo Kurdan li rî ye. "Rojnamen Kurdan ji bi kîfxweşî navê endamên ev hûkmata Kurdi weşandin û her weha, ... Lî li dû ku ev herême ket desten Ermeniyan, wekî em nuha dibînin, ci herêmî otonom û ci hûkmata Kurdi li holê nîn in. Ne tenê ev, KURDISH LIFE dinivîsine, ku "bi dagirtina vê deverê ji haliyê hêzîn Ermenî re, dîroka ji 2200 sal ya hebûna Kurdan li vê derê hat dawiyê. Heta heger Azari deverê cardin bi dest xin jî, ew û nehîlin van Kurdan vegerin. "Nivîsara

Buletene diyar dike, ku Laçîn bi mebest ji haliyê hêzîn Ermenî de hatiye bombebarandin û şewitandin, 25.000 kesen tê de, ku bi piranî Kurdi bûne, neçar dike, ku birevin Azerbêycan. "Li Laçînê pirtûkxaneya Kurdi û entîkxane ji hatine şewitandine."

Kurdistan Life iddia dike, ku îlankirina Komara otonom ya Kurdi ji haliyê Ermeniyan de sê armancen xwe hebûn.

1) Kerrkirindana rexneya ji haliyê Kurdan de, li dû paqîşkirina herêmî ji Kurdan;

2) Xuyakirina pîrsa NAGOR-

**Gelêni Ermenî û Kurdi bi sedsalan li kîleka hev û li gel hev jîyane. Di navbera wan de cîrantiyeke bi biratî hebûye. Dema em iroj rewşa gelêni komarê Yûgoslavya ya berê dîdin ber çav, em dibînin ku birayen duçawa xwîna hev ji bo piçek erd dirijin û malen hev dişewitînin. Komara Tirkîya iroj ne hebûna Bakurê Kurdistanê, ne ji Roavayê Ermenistanê dipejirine.**

NO-KARABAX, wekî ku ne tenê Ermenî, lê herweha komên etnik yên din jî li dij Azeriyan rabûne;

3) Da ji cîhanê re xuya bike, ku devera di navbera NAGORNO-KARABAX û Azerbêycanê de ne devereke Azerî ye. "Tişte balkêş ew e, ku îlankirina komara otonom ya Kurdi ne ji paytexê wê, Laçînê, lê ji Yerîvanê derket," dinivîsine Kurdistan Life. "Danzanîna ji Ermenistanê Kurdeki bi navê Wekî Mistefâ, wekî Serokê Partiya Tevgera Azadiyê û Serekwezîr Komara Kurdi ya Otonom bi nav kir." Li gor gotarê, dema Ermeniyan dîtin, ku ne cîhanê xema xirabekirin û şewitandina Laçînê kişand, ne jî rôxistin û Partiyen Kurdan li dervayê herêmî behsa Laçînê û trajêdiya wê kirin, wan dest pê kirin êrişê bibin ser gund û bajarokên deverê yên din jî, ku car din beşekî şenîye wan Kurd bûn. Tête gotin ku bi encama van êrişan trajêdiyeke ji trajêdiya Kurdan Başûrî Kurdistan ya sala 1991'ê ne kîmtir cîh girt. Çawa wê demî bi he-zaran Kurd bi çiya û kaşan ketin, di ev devera di navbera NAGORNO-KARABAX û Azerbêycanê de jî di adara 93'an de dora "70 000 kes, ku piraniya wan Kurdan KELBAJAR û gundên dorhêlê bûn bi kaşan ketin. Bi tevâh 150 000 Kurdan û deverê bûn penaber û reviyan Azerbêycan, lê ew di nav 900.000 penaberên din de wenda bûn û keski behsa trajêdiya Kurdan nekir. Heta bi Kurdan bi xwe be jî, rojname û rôxistinê wan her behsa

stemkariya Azeriyan kirin, bêyi ku ci rexneyan li Ermeniyan bigirin, "dinivîsine Kurdistan Life. Kurdan Laçînê, KELBAJAR, JIWANŞER û dora 70 gundên dorhêlê fêhm nedikirin, çima hêzîn Ermenî warêwan bombebaran dikine. Wan xwe wek hevalen Ermeniyan dizanîn. Li gor Buletene, Ermeniyan gelşa gelén Yûgoslavya ya berê bi bîr hanîn û xwaztin deverê ji nuha de ji Kurdan paqîş bikin. A nuha, nema behsa Komara Kurdi ya ottonom tê kirin. wekî Mustefa ku divabû bibe. Serokwezîr komarê li Yerîvanê danıştiye û hêzîn behsa stemkariya Azeriyan dikêya, tevi ku herêma Kurdi di dest Ermeniyan de ye û hemî Kurd jê reviyane Azerbêycanê ya. Li gor KURDISTAN LIFE, "Ermenistanê çeya wî ji bîr nekiriye û gotiye, hemî pereyên ji bo Kurdan werin xerc kirin dê bi desten wî werin belav kirin." Buletene herweha diyar dike, ku li dû vê yekê, Ermenistanê damezrandina Navenda Çanda Kurdi ûlan kiriye. Rojnameya OZGUR GUNDEM û Rapora Kurdistan, ya li London tê weşandin ji behsa vê navendê kirene. Li vir KURDISTAN LIFE behsa xeşimtiya Kurdan dike û pîrseke tehlükê tîne holê: Heger Ermenistan bi şêweyeke aşkere Kurdistan Tirkîye wek Roavayê Ermenistan mezin bi nav dike û dixe xerîteyên xwe û hêzîn Ermeni yên NAGORNO - KARABAX 150.000 Kurd neçar dikin da ji warêwan xwe birevin û li Azerbêycanê bibin penaberên perîşan, gelo çawa navenda Yerîvanê ji bo çanda Kurdi dikare sûdê bi şêweyeke ciddî bigîjhîne berjewendiya netewî ya Kurdan?!

Di dema ku min ev gotara xwe li dû xwendina nivîsara KURDISTAN LIFE amade kir de, min hay bi şêweyeke rîk û pêk ji pîrsa Kurdan ev devera Qafqasê nîn e. Hêvîdar im kesen haya wan jê heye bi şêweyeke ciddî û objektîv li ser bibêjîn û binivîsin, da rastiya tevâhî derkeve holê; heger ne ji bo berjewandiya hemî Kurdan be jî, ji bo 150.000 penaberên Kurdi, heger rast li Azerbêycanê penaber in. Li milê din, gotina ku niştimanperweren Ermenî wek Roavayê Ermenistan behsa Bakurê Kurdistanê dikin, ne tiştekî veşartî ye. Gelên Ermenî û Kurdi bi sedsalan li kîleka hev û li gel hev jîyane. Di navbera wan de cîrantiyeke bi biratî hebûye. Dema em iroj rewşa gelén komarê Yûgoslavya ya berê didin ber çav, em dibînin ku birayen duçawa xwîna hev ji bo piçek erd dirijin û malen hev dişewitînin. komara Tirkîya iroj ne hebûna Bakurê Kurdistanê, ne ji Roavayê Ermenistanê dipejirine. Lî da ji rewşa Yûgoslavya ya berê ibret were girtin û da sibe herdu gel xwîna hev û din nerîjin, heye ku baştir be, berpîsiyaren herdu gelan ji nuha ve li gel hev danişin û bi şêweyeke ciddî xuya bikin û bigîjhîne peymanekî, ka ku der Kurdistan û ku der Ermenistan e. Li milê din, divet were aşkere kirin, ka ci bi Laçînê û Komara Kurdi ya Otonom hat.

**NEYNIK**

## Pakêta demokratîkbûnê, pakêteke vala ye

Halim Can

Hêviyên ku hin dilpak û naivên hemwelatiyên Tirkîye û Kurdistanê ji pakêta demokratîkbûnê dikirin û digotin nisbî be ji dê hukûmeta dubaskî ya Çiller-Karayalçın hin mafen Kurdistan nas bike û herî hindik heqê televizyon û radyoyê bide wan û ji bo Kurdan dê dezgehîn ilmî vekin, vala derket, niyeta paqîj a van hemwelatiyan di qirika wan de ma û pakêta demokratîkbûnê wek pakêteke vala ji Kurdan re hat diyarikirin.

Ev kesen naiv û dilpak nizanibûn ku li Tirkîye meclîs, partî, hukûmet, organen qanûnçekirinê, birêvebirinê û mahkûmkirinê di bin emrê Erkanî Herb de ne û tenê ferمانen eskeran li Tirkîye derbas dibin. Ew eskeren ku hergav dibîjîn emî koka wan ji ortê rakin, dê çawa rî bidaña, hukûmeta dubaskî da ku di çerçewa "mîsakî millî" de hin mafen nisbî yên kulturi yên Kurdan bi resmî bête qebûl kirin? Ev li dijî tebîeta jiyanê ya generalen e.

Nihayet pakêta ku raya giştî ya Tirkîye û Kurdistanê bi "meraq" li bendê bû, vala derket; ne tenê gelê Kurd, herweha gelê Tirk ji pê nekêfxweş bû û nekêfxweşîya xwe bi tevgeren cur bi cur nişan da.

Hin xalêna Qanûna Bingehîn ya Tirkîye bi vê paketê re careke din berbiçav re têr derbas kirin û wek berî 12'ê llonê dê partiyen legal yên Tirkîye karibin rôxistinê xwe yên ciwan û jinan ava bikin, li ser sendîqa, komele, weqf û li ser komeleyen civakî yasaxa siyasetkirinê bête rakirin. Emrê dengedanê ji 21 salî wê dakeve 18 salî û emrê kesen ku bibin milletwekilî jî ji 30 salî dê dakeve 25 salî. Tenê di pakêta demokratîkbûnê de xaleke nuh heye ku ew ji hemwelatiyên Tirkîye yên li derveyî welêt di hilbijartinan de mafê dengdanê bi dest dixin. Ew tiş jî bi destxistina dowîzan ve girêdayî ye.

Wek tê zanîn turîzma Tirkîye ketiye krizeke mezin, biyanî edî wek berê naçin tatila xwe li Tirkîye derbas naçin; ji ber vê ji işal dewleta Tirkîye bi desten dezgehîn xwe yên li derveyî welêt kampanyayen mezin vekirine ku hemwelatiyên wan tatila xwe li welâtê xwe derbas bikin û bi vî hawî dixwazin hemwelatiyên xwe pûtepêdanê Tirkîye kirene. Ji bo dewleta Tirk dowîzen hemwelatiyên wê dê ji bo aboriya wan dermanê çavan be, pêwîst bû dewleta Tirkîye ji ji bo wan dowîzan bi dest xe û berdewamiya wan garantî bike tiştek bida wan; ev ji heqê dengdanê bû.

Pakêta demokratîkbûnê ji bo Kurdan vala û bê mahne bû. Ew herêma ku edî mafê jiyanê jî ji ortê rabûye; nîvî nîfusa wê esker, MIT, kontr-gerilla, tîmîn xûsûsî, "parastvanen gund" e, ev xalêna ku xwedegiravî Serokwezîra Tirkîye Tansû Çiller dibêje ji bo hemû "Tirkîye" derbas dibin, dê disa li Kurdistanê derbas nebin. Ji ber ku li Kurdistanê siyasetkirin ji yasax e û iro li Tirkîye du huqûqên cûda hene; ji Edenê û wir de huqûqa eskeran derbas dibe.

Hukûmeta dubaskî jî zanibû pakêta ku wan derxistîye bersîva jiyanê nade û organizasyonen civakî dê reaksiyon nîşan bidin, û dan jî, disa wek hergav hukûmet xwest ku bala raya giştî bide adreske din; rabû disa kampa Zelê ya PKK'ê bombe kir. Edî hukûmete ji xwe re kireye adet ku mesela PKK'ê di siyaseta xwe ya bi sernekîti de bi kar bîne. Wexta di 24'ê Sibatê de hukûmete Lîrayê Tirkîye li hember Dolarê Amerîkî û Markê Almanî devaule kir, disa ji bo ku bala raya giştî bide ciyekî din kampa Zelê bombe kir, di 5'ê Nîsanê de pakêta aborî ku hemû aliyan civakî li dij bûn, hukûmete disa ji bo ku bala raya giştî bide noqteyek din, içar orduya Tirkîye xist axa rizgarkirî û li dij PKK'ê operasyonan çekir. Di pakêta demokratîkbûnê de ji disa xwest ku bala raya giştî bide aliyeke û careke din li Zelê xist. Lî edî hukûmete du baskî di van kirinê xwe de ji nikare bi ser bîkeve.

Edî eskere bûye ku heta li Tirkîye mafen Kurdistan neyên naskirin û Kurd negîhîn azadiya xwe, demokrasî nayê Tirkîye û di paketên ku vedikin de ji pîrsa Kurd neyê bi nav kirin û neyê çareserkirin, bi sedan pekêtîn weha vekin ji dê ev pakêt ji bo gelê Kurd tim vala bin û tu mahneye ifade nekin.

## RAMANÊN RAMANWERAN

## Dost û dijmin

S. Esmer

**B**erî çend salan bersiva kî dost e, kî dijmin e pir hêsan bû; ji ber ku qalibên hazir hebûn. Li dînyê du bendî hebû; benda împerialist û benda sosyalist. Tevgera rizgarîwaza Kurdistana Bakur hevalbendê xwe rista sosyalist qebûl dikir. Piraniya rêxistinê Kurdi li Kurdistana Bakur anti-imper-yalist, anti-kolonialist pir caran anti-siyonist bûn. Di pêvajoyê de pir cudabûn û ji hev vejetandin çebûn û sedemên wan cudabûna her çend meselî ideolojîk hatin nîşandan jî, lê di eslê xwe de ne weha bû; rewşa ku iro em têde ne vê yekê rast der-naxine. Van cudabûn û vejetandinan roleke pozitif nesistin, ji ber ku rêxistin ji hêz ketin û pirtir berbi fikra çep cûn ev yek nebû aifikar ji bo afirandina politikayek nû û mantiqke guherti. Her politika kevn û mantiq berê bi awakî tûjtir hat berdewamkirin. Li ser navê şoşegerî û welatparêziyê pir tişten ne rast hatin kîrîn, bi sedan bûyerên ku meriv naxwaze bahs bike çebûn, iro ji ev mantiq hakîm e. Em dikarin doh wek doh qebûl bikin do dunya du-bendî bû em jî baş yan xerab dibûn alî bendekê. Lî iro rewş ne weha ye; dînya serûbin bûye, rista sosyalist ji binî de hilweşîya, pir keleb û merkezîn dunyayê pê bawerî anîbû hatin xwarê û belavbûn. Dema em nuh hatin Ewrûpâye em û Rusî, Poloni, Macarî û hwd. bi hev re diçûn qursa zimanê Swêdi, em û wan herdem radibûn hevdû, me pîrsa welatê wan ji wan dikir. Wan jî digotin "li we-latê me zulum heye diktatorî û birçibûn heye." Me jî ji wan re digot "hûn derewan di-kin, hûn diji şoşerê û dijî sosyalizmîne." İcar gava ku serokê welatên sosyalist bibejin em bi ser neketin û bijî serok Bush û em Kurd jî bibejin "sosyalizm xurt dibe," bi rastî ne karê aqila ye. Divê em realist bin û guhartînê iro li dunyê çedîbin bibînîn û li gor wan politika bia-firînîn, sosyalizm ji xwe xurt nebûye û ji %90'ê wan partîyen sosyalist û komunist navê xwe gûhertine. Ew der dorênu ku dibêjin sosyalizm xurt dibe argumenten wan neticeyên hilbijartînê dawî ku li Estland, Polonya û hin welatên din in.

**D**îvem xwe nex-apînin, iro rewşa dunyê hatiye guhar-tin dunyayek nû peyda bûye, divê em li gorî wê xwe big-herîn û û vê dunya nû de xwedî dostênu. Weke doh em bêndera pûş ne-kutin. Doh me digot Sovyet bûye welatê temamê gel, êdi paş de zivirandin ne mumkun e. Lî jiyanê tişten din derxist ber me. Helbet dema ez weha dibêjim gerek neyê wê manê ku divê em Kurd dijî sosyalizmî bin. Lî ez dibêjim sistema sosyalist iro têk çûye. Em wek Kurd divê giraniya xebata xwe bidin meselên xwe yêne millî, em disa hedefek şas-ne-

din ber xwe. Em ji bo platformeke weha xebatê bikin ku bikeribe welatê me rizgar bike. Fikra çep iro li dunyê serê wê jêbûye û li Kurdistanê jî piyê wê ne li ser erdê ye. Dijmin bi xwe jî dixwaze ku tevgera rizgarîwaz di nav dun-yayeke çep de be û têde bifetise. Lî divê em xwe ji vê yekê xelas bikin, em berî her tişti welatê xwe rizgar bikin muesesên xwe ên netewî avabikin, xwendegeh û instiûyan ava bikin ku lêkolin li ser ziman, dîrok û kultura Kurdi bikin, em dikarin fikra xwe ya sosyalist, pêşverû di welatê xwe yê rizgarkirî de bidomînin. Wek insanî pêşverû ne rast e em ideolojîya xwe têxin pêşîya xelaşîya mîletê xwe.

**L**î iro li dunyayê pêvajoy-eke nû dest pê kiriye, em wek Kurd nikarin pêşengîya vê pêvajoyê bikin û lêkolinan li ser nûjeniya idolojîya sosyalizmê bikin. Ev rastiyeke divê em qebûl bikin. Ji ber ku welatê me bindest e, senet û teknik li welatê me pir kêm e. Tu muesesên me yênetewî tuneye ku xizmetekê ji vi tişti re bikin. Ew welatên ku di warê senet û teknik de pêş in û çîna karkir bi rêxistin e di derheq vi tişti de tu lêkolinê berfireh nekirin

**H**ebet idêoloji ewê hebin û faktorên ku nakokiyê sosyalizm û kapitalizm pêk tûnîn hîn ji holê ranebûne; wek sermiyandarı kedxwari, zîlm û zor û zevî û pere hwd. di nav milletê Kurd de jî ew tişt peyda dîbin. Lî iro li dinê pêvajoyek nû despêkîriye, em wek Kurd nikarin pêşengîya vê pêvajoyê bikin û lêkolinan li ser nûjeniya idolojîya sosyalizmê bikin. Ev rastiyeke divê em qebûl bikin. Ji ber ku welatê me bindest e, senet û teknik li welatê me pir kêm e. Tu muesesên me yênetewî tuneye ku xizmetekê ji vi tişti re bikin. Ew welatên ku di warê senet û teknik de li pêş in û çîna karkir bi rêxistin di derheq vi tişti de tu lêkolinê berfireh nekirine. Ne rêxistinê nû bi navê sosyalizm çebûye, ne jî tu alimên nû rabûne gotine "pişî pêncî salêñ din wê aqûbeta sosyalizmê weha be." Weki sitratejiya vê rêxistina wê, sistema ekonomik şîklê wê heta, navê wê çibe, rewşa sosyal, siyasi û wê reformen çawa bide ber xwe. Ji bo van tiştan têzên nû lazim in. Gerek ya platformek xurt pêk bê, yan jî çend alimên Kurd rabin tezek nû deynin û li dunyê belav bikin. Bê guman wê li dunyê terfdar peyda bike. Lî na eger em bibejin va li ser Estland û nizanim kîjan welatên din komunistan %2 dengê xwe zêde kîrin û vê yekê wek pêşketin qebûl bikin

yan jî dahatûya sosyalizmê bi wê ve girê bidin em tenê xwe dix-apînin. Ji ber ku ez bawer nakim tu bînayên saxlem li ser xirba Yelstin û Gorbaçov ava bibe. Ev politika şaş ne tenê di derheqê sosyalizmê û welatên sosyalist de xwe nişan dida.

Lî belê li hember Îsrail ji her wusa bû. Îsrail ji me re bûbû dijminê 5'an, pişî her çar dewletê ku welatê me dagirkirbûn. Ereban digot, "Îsrail siyonist e gerek dewleta Îsrail ji holê rabe" me jî digot rast e. Lî ev bi ya min ne rast bû gerek me Îsrail ji xwe re dost bidîta. Ji ber ku gotinek bay û kalan heye dibêje "dijminê dijminê te dostê te ye." Lî em bibêjin ev bi Kurdi bû ji bo wê zêde qedre wê tûnebû. İcar wek insan wek şoşeger mevir lêbinêre bi rastî gunehkariyek mezin e. Ma rast e 3 milyon insanên ku li Îsrailê dijîn tevsiyonist bûn, heger weha be, Kurd ji tev di şexsê PKK'ê, de terorist in.

Lî bi ya min rastî ya meselîne weha ye. Her insanî siyasi dizane ku li Îsrailê partiya kommunist hebû tevgera aşixwaz hebû li diji qetfiyam bi dehêñ caran meşen wan, protestoyê wan çebûne. Bi ya min doh me sîyaseteke şaş li hember dewleta Îsrail û

mîletê Yahûdi meşand, me wek Kurd çawa digot "gerek Filis-tîni vegeerin ser axa xwe û qedera xwe bi destê xwe tayîn bikin," gerek me bigota "mafî dewleta Îsrail ya jîyanê jî heye." Ev kîmasîyeke ji bo dema pêş pir girîng e. Her çîgas doh me ew cesaret bi xwe re nedîbe jî, iro divê em dersan jê bigrin û dubare nekin. Lî mixabin ku gelek insanên me yêni siyasi û heta rêxistinê siyasi, hîn jî bi çavê doh li meselan dinêrin. Ji bo ku Filistîni bi dewleta Îsrail re rûdinê, hindik maye ew wan jî xayîn ûlan bikin. Ev mantiq tenê ji me re dijminan zêde dike. Hin jî dibêjin, "împerializm dixwaze Kurdistanek wek modela Îsrail ava bike." Baş e, ez dipirsim; ma gelo dostê me kî ne? Awrûpî kapitalist in, Amerîki emperîyalist in, Japon û Çin jî ji xwe ne dostê me ne. Ma hema dinya maye Iran, Iraq, Tirkîye û Sûriye. Ev ci mantiq e ku "dostê me ji me re kirine dijmin û dijminê me ji me re kirine dost." Bi ya min heqê me li politika tuneye ku em wê weha serûbin bikin. Divê em dost û dijminê xwe ji nû ve di ber çavan re derbas bikin, kî ji me re dost e, kî dijmin e. Ez dibêjin, "gerek em Kurd dostê Îsrail bin û ne dostê Iran, Iraq, Tirkîye û Sûriye bin", ji ber ku Îsrail ji wan demokratiktir û insantir e, ji bo Fransa û Almanyayê ji ez eyîn tişti difiki-rim.

## Şîriyên me

Zinarê Xamo

Hevale me Zinarê Xamo heta wextekê û mikaribe quneikê aye berdewam bike. Em hêvidar in ku ew û pisti demekê kurt, disa bi xwendevanan re be.

## Kurdistan, berî ku dereng be \*

Huda El Huseynî

Serê surprîz yê ku li Kurdistanê dest pê kir dewletê ku bakurê Iraqê diparêzin şoqe kir û ev yek dikare tesîrê(kartekirin) li ser da-hatûya hemû Kurdan bike.

Ne mumkun e ku meriv tu uzrên alîyên ku li Kurdistanâ Iraqê li dijî hev rahiştine çek û şer dikin qebûl bike. Weka ku YNK çapemeniya Bexdayê bi derewkariyê gunehbar dike û dibêje ew dinivîsin ku Kurdistan wêran bûye, ev nayê wê manê ku şer nebûye. YNK di bersîva xwe de dibêje "diktatoriya Iraqê ji bo ku pênc hezar

gundêne Kurdistan wêran bike, pêwîstiya wî bi 25 salan hebû... Vêca çawa dibe bûyerên navxwe yêndu hefteyan dikarin her derê wêran bikin". Tiştekî seyr e. Şert ci dibin bila bibin nayê qebûlkirin ku Kurd li Kurdistanâ Iraqê li dijî hev rahêjin çekan. Ji ber ku bûyerên weha tenê seetek jî bajon nav û denge Kurdistanâ Iraqê xera dikin û tesîrek xerab li ser dewletê ku Kurdistanê diparêzin dikin, û li ba dost û dilxwazên Kurd û Kurdistanê nerazibûnê peyda dikin.

Eger dema ku problemen navxwe çebûn, ev problem çîgas mezin bin jî, ji bo parastina demokrasiyê, otonomiyê û gelê Kurd û bindest; ku çareserkirin ne bi riya nûnerên gel û parlamento be çima beriya du salan hilbijartin çebûn û çîma parlamento? Çima rakirina şîara "ji bo Iraqê demokrasî, ji bo Kurdistanê otonomi".

Kurdên Iraqê dema li hember serokê Iraqê Seddam Husêñ bi şoreşa xwe ya sala 1991'an ya ku pişî şerî rizgarkirina Kuveytê pê rabûn rez û ihtirama dinê qezenc kirin. Dema ku partîyan li hev kîrin ku hilbijartin çebibin -her çîgas bi tevayî ne durust bûn jî; ne mantiqîye ku du partî wek hev dengan bînîn û nûnerên partiya sisîyan nikarîbin derbîkevin- û piştre PDK û YNK bi hevre tîfaq çêkirin ku hukûmeteke koalisyonî pêk binîn, dinyayê hîn pirtir piştigiriya wan kir. Di dema ku Li Kurdistanâ Iraqê ji ber problemen aboriyî tirsî li ser demokrasiyê hebû, ji ber perçeyek ax di navbera herdu aliyan de ser derket û YNK li Erbilê avahiya parlamento dagîr kir.

Gelo dibe ku yekîtiya di navbera Kurdistanâ Iraqê de wek mînak ji yekîtiya herdu Yemenan xerabir be? Eger yekîtiya otonomiyê tenê ji grûbek Kurdan re weha bi xwîn be, dê yekîtiya dewleta Kurdi ya serbixwe ya ku ewê kurdên dewletên herêmê bicivîne çawa be?

Ji berpîrsiyarêne Kurdistan tête xwestin ku bi berpîrsiyarbin û ji daxwazên xwe yêni kesatî werin xwarê, an na divê dev ji vî karî berdin. Aboriya Kurdistanâ Iraqê ji ber du ambargoyan di rewşa herî xerab de ye. Ambargoya navnetewî li dijî Iraqê û ambargoya navnetewî û ya Iraqê dijî Kurdistanê. Heqê her kurdeki ye ku jiyanekî normal bixwaze. Eger berpîrsiyarêne Kurdistan nikarin vê yekê bi cî bînîn bi kîmanî divê wî heqî di xwe de nebînîn ku jiyan heyî jî biherimînin.

Herdu partî li Kurdistanâ Iraqê li ser kîjan xenîmetê şer dikin? Dinya wê çawa Kurdistanê ji talûkeya ku ji derve wê tehdît dike biparêze, dema ku talûkeya herî mezin ji hundir be? Rewşa aboriyî krîza herî mezin e ku divê berpîrsiyarêne Kurd jê re çareyekê bînîn. Xuya ye ew hîna negîhaştine wê radeyê ku bi hevîşkiya demokrasiyê bi hev re di hukûmetekê de cî bigrin, lê divê ew qerara xwe bidin û bîr ve bîbin. Tişteku nuha ji wan tête xwestin pişî derêxistina çekdaran ji avahiya parlamento, civandîna parlamento ye û girtina bîr yara çareserkirina dawîn ya şerî navxwe ye. Piştre divê bîr bête girtin ku hilbijartînê nû û durist bîne çêkirin û dûre jî divê hukûmeteke bi hêz bête avakîrin ku armanca wê parastina Kurdistanê û xelaskirina aboriya wê û gelê wê be, ne ku parastina siyaseta kesatî be û gelê Kurd ku xewna wî ne tenê otonomî ye her weha dewleteka Kurd a serbixwe ye, biperçiqîne.

\* Ev nîvis ji rojnameya Erebî "El Şerq El Ewset" 25.5.1994 jîmar 5657 an ji alîyê N. Ali ve hatiye wer-gerandin.

## Reportaj

Arkelog Baqî El Melle:

# "Mîtanî û Horî yek in; Horî navê milet, Mîtanî jî navê dewleta wan e"

Şoreş Firat

Beşek ji pirtûka M. Emîn Zekî; "Dîroka Kurd û Kurdistanê" li ser dîroka Mîtanîyan e. M.E. Zekî di pirtuka xwe de dide xuya-kirin ku Mîtanî li başûrê Cizîra Botan di dawîya qîrnâ 16'an de berî zayina Îsa dewleta xwe da-dimezirînin û "Waşokan" dibe paytexte wan. Ev dewlet dibe dewleta çaremin ya mezin di de-verê de.

Mîtanî di şerê Misriyan de winda dîkin lê Misriyan ne dikaribûn erdê Mîtanîyan bi destxîmin. Lê Mîtanî qels dîbin û berê xwe didin mintiqâ rojava ya Firat a jorî. Di dawîya qîrnâ 14'an de mintiqâ rojhilate Firatê dikeve bin destê Aşûriyan. M. Emîn Zekî wek di pir-tûka xwe de dide xuya-kirin ku zimanê dewleten li ser axa Kurdistanê hatine avakirin Îndîawrûpî ye.


Baqî El Melle (ji Kurdistana Sûriyê ye) di 1989'an de doktoriya xwe li Moskovayê li Înstîtuya Arkeolojîyê temam kiriye. Navê xebata wî; "Kultura Nawendî ya Mezopotamyâ" Qîrnê XVI - XIV berî mîlladê (Kultura Mîtanîya) ye.

Baqî di xebata xwe de dide xuyakirin ku mamoste M. Emîn Zekî yek ji wan kesen yekemîn e ku li ser dîroka Mîtanîyan a sîyâsî sekinîye û lêkolîn û xebatê hêja û giranbuha kiriye. Lê ji aliyê din ve heval Baqî dibêje ku mixabin heta roja îro di derheqa dîroka eseri a Mîtanîyan de xebatê ku hatine kîrin û hatine nivisîn ji, bi awakî ji hev cuda û ne sistematîk pêk hatine.

Baqî El Melle xwendina xwêyi bilind li ünîversîta Şamê di beşa dîrokê de di 1983'an de temam kiriye. Piştre du salan bi heyeta Frensî re di der heqâ eserên dîrokî de xebat û lêkolîn wî çedîbin.

Di 1989'an de dema doktoriya xwe di unîversîta Moskovayê di-ki bi heyeta Sovyetî re ji teref înstîtuya arkeoloji yê têr Sûriyê li "Tilxezna" di navnbeyna bajarê Qamişlo û Hesekê de dixebeitin, di vê xebatê de Baqî dibêje ku ew rastî gelek tiştînînterestant hatine, tiştîn 3500 sal berê. Lê em rastî eserên Mîtanîyan nehatin, lê armansa cûndina me ew bû ku em bikaribin eserên Mîtanîyan bi destxînin. Baqî dibêje ku mirov nikare ew tiştîn 3500 sal berê bike malê qewmekî an miletekî, ji ber ku ew bi xwe bi eserên kulturî ve girêdayî ye.

Li gor heval Baqî dide xuya-kirin Mîtanî û Horî ew bi xwe yek in, yanî Horî wek milet û Mîtanî navê dewleta Wan e û Mîtanî ji grûba Îndîawrûpî ne û 3000 sal berî mîlladê têr mintiqâ Kurdistana li derûdora çîyayê




Heyeta Enstituya Arkeolojîyê ya Moskovayê di sala 1989'an de li Tilxezna li mintiqâ Qamişloyê lêkolînên arkeolojîk kir. Baqî El Melle (li milî rastê) bi mamosteyê xwe yê Enstituya re.

Zagrosê bi cîh dîbin û bi dûvre li dora Wan û Ûrmîyê û li Mezopotamyayê bi cîh dîbin. Li wan herêmân gelek ese-reñ Qîrnê XVIII hatinîn keşfikirin. Di dawîya Qîrnê XIV de di destpêka Qîrnê XV de dewleta Mîtanîyan tête avakirin û Waşokan dibe paytex-tê wan. Misrî navê "Na-harîna" li dewleta Mîtanîyan dîkin û her-wîha Akadî jî navê "Hanî Kalbat" li dewleta Mîtanî ya dîkin. Li gor texmîn û zanîna arkeologan Waşokan li dora Nisêbîn û Xabûrê dikeve.

Li gor Baqî dide xuyakirin ku li der û dora bajarê Kerkûkê (nêzî Nûzî) li mintiqâ Yorgan Tepe di 1925 û 1938'an de heyeta Emerîkî tiştîn gelek girîngîn ên eseri ku bi dîroka jîyan a Mîtanîyan ve girêdayîne keşfî dîkin. Eseren Nuzîyan wek pirtük bi 2 cîldan hatine weşandin. Li gor tête diyarkirin ew rastî 4000 nivîsandînîn bismarî yê ku bi zimanê Akadî û Horî hatine nivîsandîn têr. Ji bili wê ji rastî gelek mohr, seramîk û sûretîn têr. Lê wekî din ji li jorî Mezopotamyâ yê rastî eserên Mîtanîyan hatine.

Li başûrê Qamişlo li Tilbirakê heyeta İngîlîzî rastî qesr û xanîyê Mîtanîyan dîbin û keşfî dîkin. Li Tilhemîdiyê (Girê Hemîdiyê) ev serê 4 salan e ku heyeta Swîsî (İsvîcre) li wir kolinê xwe dîkin. Ev heyet li gora didin xuyakirin rastî gelek qehfik, seramîk û tiştîn din yê bi Mîtanîyan ve girêdayî hatine. Her wiha li gelek herêmân Kurdistana arkeolog rastî eserên Mîtanîyan têr wek li Alalax, Tel-letsan (Qretî), Telfexariyê jorî Ey-nelerebê Kobanîye sînorê Kurdis-




Seramika Mîtanîyan li herêma Kerkuk(Nuzî) û Qamişloyê (Tellbirak)

tana Sûrî û Kurdistana Turkiyê li der û dora Mêrdînê. Xebata arkeologan ku li Kûltepe li dora bajarê Kayserî rastî gelek giranbuha yên girêdayî bi dîroka Mîtanîyan ve hatine. Wê demê Bajar û mintiqê Mêrdîn, Suleymaniye û Kerkûk herêmân ticâri yê Mîtanîyan bûn.

Heval Baqî di dawîya lêkolîna xwe ya doktorayê de dibêje ku herçendî ez bi temamî li ser vê baryê ranewestiyame, lê divê ku arkeolog û tarîzanîn me derheqê vê yekê de bixebeitin. Çunki tarîx tarîxa me ye. Ger em lê nekolîn û ji taristan û kuraniya tarîxê der-nezin tu kesekî din tuneye ku vê yekê bike.

Baqî El Melle di vê xebata xwe ya doktorayê de ji meteryalîn bîyanî, meqale û pirtükîn bi zimanê İngîlîzî, Fransî, Almanî, Îtalî, Rûsî û Erebî sùd wergirsiye.


Celadet  
Ali Bedirxan;  
*Bingehêne Grame-ra Kurdmancî*,  
Weşanê NÜDEM, 1994,  
Stockholm, 93 r.  
Kurmancî




Rohat;  
*Di Folklorâ Kurdi de Serdestiyeke Jinan*,  
Weşanê NÜDEM, 1994,  
Stockholm, 153 r.  
Kurmancî




Bûbê Eser,  
*Gardîyan*,  
Weşanê Roja Nû, Stockholm, 1994, 165 r.  
Kurmancî, Latînî.



Dostoyevski;  
*Şevêni Spî*, werger: F irat Cewerî, Weşanê NÜDEM, 1994, Stockholm, 79 r. Kurmancî, Latînî.




John Steinbeck;  
*Mîsk û Mirov*, werger: F irat Cewerî, Weşanê NÜDEM, 1994, Stockholm, 126 r. Kurmancî, Latînî.




Tord Nygren;  
*Soro lê digere û lê digere*, Weşanxana APEC, 28 r. wergera ji Swêdî Weşanxaneyâ Apec, 1994, Stockholm. Ji bo zarakan hatiye amade kirin. Bi wêneyên rengîn in. Kurmancî, Latînî.



M. Sîraç Bilgin; *Barzanîn Son Yilları*, Kürdistan'da Çok Partili Sistem, 1975-1979, Hiddekel Förlag, Stockholm, 1993, 151 r. Tirkî.



Petra Szabo;  
*Hîst-Hîst*, li der û dora avê, Weşanxana APEC, 24 r. wergera ji Swêdî Weşanxaneyâ Apec, 1994, Stockholm. Ji bo zarakan hatiye amade kirin. Bi wêneyên rengîn in. Kurmancî, Latînî.



Weşanê Nuh  
bo zarakan hatiye amade kirin. Bi wêneyên rengîn in. Kurmancî, Latînî.

Petra Szabo;  
*Hîst-Hîst*, li mala me, Weşanxana APEC, 24 r. wergera ji Swêdî Weşanxaneyâ Apec, 1994, Stockholm. Ji bo zarakan hatiye amade kirin. Bi wêneyên rengîn in. Kurmancî, Latînî.

Zeynelabidîn Zinar; *Kadîna Mîskan* (çîrvanok), Pencînar; Weşanxaneyâ Çanda Kurdî, Stockholm, 1993, 144 rûpel, Kurmancî,




Gabar Çiyan; *Süryani-Kildani* (Asurlar-Aşûri), 4, Vatanî da Dîşen Aşurî Kurî Üniversemîte Orta Dîşen (Asurlar-Aşûri), Beraber yaşıdagımız halklar), Nsibin Yayinevi, 1993, Stockholm, Tirkî-Kurmancî-Suryanî, 54 r.

Edward Petîka; *Mîtolojîyên Mezopotamyâ*, Weşanê APEC, Stockholm, 1993, 88 rûpel, Kurmancî, wergera ji Bulgarî: Cemal Batun, Illustrasyon: Vanya Lapardova-Batun



Hejar; *Be Yadî To Dejî Dilim* (helbest), Le bilawkirawekanî Komeley Ferhengî Swêdî-Kurdistan, Stockholm, 1993, 75 r. Soranî.

بە يادى تو دەزى دەن



Bûkegenimaşamî; (çîrok), Film Centrum, 1993, Stockholm, 16 r. Kurmancî, wergera ji Swêdî: M. Lewendî, B. Şaşwar. (Filmê wê ji bi Kurdi heye).



Hêviya min ew e, ez rojekê nivisareke fireh li ser Qedrî Can binivisim, têde li ser jiyan, xebat û nivisarê wî bisekinim. Belê, ez vê hêviyê ji pêşerojê re dihêlim û nuha van çend xêzan pêşkêşî xwendevanan dikim, têde bir û baweriyê xwe derheqa nivisarê Qedrîcan ên di Hawar, Ronahî, Roja Nû de belav bûne, diyar bikim.

Di gotara "Silêman beg Bedir-Xan" de, Qedrîcan behsa xortekî hozan i bîst û du salî dike. Wî xortî di ber welêt de xebat kiriye û şehîd ketiye: "Min ji bi vê hêncetê dil kir serhatiya Silêman begi di vê kuncikê de vejinim û pêra navê wî ji wundabûnê xelas bikim". Belki ew tirs tîrsa wundabûna navê welatparêzî -dema nivisandina wê gotarê hebû, lê nuha, di vî zemanî de, gava mîletê Kurd şiyar e, ew tirs nemaye. Ji gotina min neyê fêmkirin, ku ez çavê xwe li ser kêmâniyan dîgrim. Di kovar û rojnameyê Bedir Xaniyan de bi dehan nav hene, ku heyâ nuha yan bi carê behsa wan nebûye, yan ji geleki hindik bûye. Yek ji wan kesen hêja bêguman Qedrî Can e.

Qedrî Can kî ye? Tu lêkolîn, yan pirtûkên karibin bersiva vê pîrsê bidin, nînin. Loma jîne-nigariya (biyografi) Qedrî Can ji me re ne nase. Belê, tiştê min ji dost û nasan û ji van nivisarê wî nas kiriye, eve: Destpêka sedsala bistan Qedrîcan li bakûrê Kurdis-

- 5.-"Ji Loriya Bedir Xan re", helbest, hej.6.
- 6.-"Hêva çarde sevî", çirok, hej.6.
- 7.-"Hesinkar", basmî (çiroka bi helbest), hej.7.
- 8.-"Sond", serpêhaî, Salqîn 12/9/1941, hej.35.
- 9.-"Guneh", serpêhaî, A.Ziwan 28/1/1942, hej.39.
- 10.-"Rojen derbasbûyi", serpêhaî, Cidêde 10/11/1942, hej.52.

#### Di "Ronahîyê" de ev nivisarê Qedrî Can çap bûne:

- 1.-"Tayek porê sipî", essê ya wergerandî (li ser sopa Menfîlî), Cidêde 3/3/1943, hej.13.
- 2.-"Sehênozozan", êssê, hej.14.
- 3.-"Gulçîn, (çirok), Ziwan 30/3/1943, hej.16.
- 4.-"Reya taze", helbest, Şam 25/5/1944, hej.26.
- 5.-"Necîra berazan", çirok, hej.28, Şam 23/4/1944. (ev çirok berê di "R.N. hejmara 48 an de belav bûye).
- 6.-"Inqilaba sor a mezin", gotar, hej. 28.

Tenê 6 nivisarê Qedrîcan di "Ronahîyê" de belav bûne, yek jê di "Roja Nû" de berî wê bi sê salan belav bûye.

#### Di rojnama "Roja Nû" de ev nivisarê Qedrî Can belav bûne:

- 1.-"Resbelek", helbest, (diyârî xorten Cizîre), 18/03/1943, hej.1.
- 2.-"Ser encam", çirok, Cidêde 14/04/1943, hej. 2.
- 3.-"Di welaîen zenbeqê gewir de", wergera pirtûka Grigorî Pêtrof e, hej. 4,5,6,7,8,9,10,11,12,13,14,16,17,19,20,24,25,40,41
- 4.-"Necîra berazan", çirok, Şam 23/04/1944, hej. 48.

(Roja Nû, hej.1)  
Xewn û hêviya niviskar Kurdistane azad û serbixwe ye û ji bo pêkanîna wê armancê hemû cûreyen xebatê helal in, heyâ şer ji:

"Bê imîdî ne qenc e, tu destê xwe ve male

Yekdest em bi repînkin, heval dibe Zil-celal

("Hawar", hej.7)

Lê baweriya Qedrî Can bêtir zanîn û xwendinê û bi medeniye-tê. Wergerandina pirtûka Grigorî Pêtrof mestirin îsbat e ji nîrîna wî re. Di pêşgotina ji bo vê pirtûkê de, Qedrî Can nabêje bê ev pirtûk ji ci zimanî wergerandîye, tenê dibêje: "Berî pênc salan bi teswîq û hurmeta duktör Ehmed Nafîz Beg, min ev kitêb wergerand zimanê Kurmançî". (R.N., hej.4). Bi xwe min nikarîbû nas bikira bê ka ev pirtûk li ku çap bûye, ez di herdu pirtûkhanen Moskovayê ên mezin de -ya Gorkî û ya Lénin- li wê geriyam, lê min tu kitêb bi vê sernivisarê, ku xwediyê wê Grigorî Petrof be, ne dît. Mana wê ew e, ku ev pirtûk li Yekitiya Sovyetê çap ne bûye û heger çap bûbe ji, belki di kovar yan rojnamen de be.

Hikmeta vê pirtûkê - mîna niviskîr goşîye û tercumên xwes-tîye bigihîne mîletê xwe- ev e: "Civatên nuh bi xwe re sitranênuh tînîn", yanê bi nuhkîrina civatan rewşa wan ji tê guhertin.



Qedrî Can (Adar 1972)

(Foto ji arşîva Armancê)

# QEDRÎ CAN û berhemên wî yên di Hawar, Ronahî û Roja Nû de

## Silêman Elî

Bi vî rengî em dibînin, ku çar nivisarê wî di Roja Nû de belav bûne, yek jê pirtûkeke wergerandîye. Loma besdarî ya Qedrî Can di rojmane de ji yên din bêtir xwanê dike.

Ji aliye babet ve, li gorî nîrîna min, sê grûp di van nivisaran de hene: Pêsi têma welêt bi hemû fireh bûn û piralîya wê ve; dûre bîrhatînê niviskîr li xerîbiyê; û ya dawî, felsefe û ramanen wî li ser jîyanê û dinê. Teví ku têma welêt mîna konekî mezîn li ser hemû nivisarê Qedrî Can hatîye vegirtin ji, mîrov kare van her sê xetê pan ferq bike, ku bi bawerîya min şopê wan di hemû nivisarê wî de berçav in.

Ev konê mezîn ne tenê li ser nivisarê wî, lê li ser tevaya jiyan wî ji vegirtiye, nexasim heyâ sala 1944'an, ku jê pêve Qedrî Can xwe mîna komünîstîkî dide pêş û dixwaze mîlet rabe ser xwe. Ew weha li Loriya Bedir-Xan ve-digerîne

"Hîsyar be êdî niho pir qenc e, Axa Kurdistanê, ji tere genc e, Paşıya xewê bizane, renc e, Rabe Bedir-Xan dê rabe lo-lo"

("Hawar", hej.6)

Hîzkirina welêt Qedrîcan di gîhîne heyâ dereceke bilind ji ni-jadperestiyê. Di helbesta "Resbelek" de niviskar nîrînen xwe venâştere, hezkirina welêt li cem wî di ser hestê olî re ye:

"Yek nîrîna Mêrdîn û Birca Bel-lek

Bi Xwedê nadim bi "Eswed Hecerê".

Tê de behsa dîroka serfiraziya mîletê Soumî (Finî) û xebata zanyar, feylesof û siyasiyê mezîn Senelman (1806-1881) dike, ku rola mezîn listeye di pêşxistin û rizgarkirina mîletê xwe de ji bin nîrê Swêdiyan. Senelman timî ji Finiyan re di-got: "Kinga mîletê me yi piçûk ji mîletên cîrânên xwe yên mezîn bi medeniye-pêşdetir bibe, hingî tehlûke namîne". (R.N., hej. 9). Ji bo pêkanîna vê armancê, Senelman bi her tiştî mijûl dibû û her tiştî dîkir: Li Gund û bajaran digeriya, Havînan kursê zanînê ji bo mamosteyen Finî çedikirin, ew hîn dikirin; Şîret li memûrên Finiyan dikirin, ji wan dixwest bi mîletê xwe re baş û nerm bin, karê xelkê bimeşînîn û bi wan re ne madtîr bin mîna Swêdiyan (R.N., hej. 14); Zabit û leşkerên Finî hîn dikirin. Di baweriya wî de "Qişle dibistan e" (R.N., hej. 16), loma geleki li ser awayê xwedikirina leşkeran dîsekînî. Se-nelman mîlet dahf dida ser xwendin û nivisandinê (R.N., hej. 25); Heya ewî xwe teví hundurê mala Finî ji dikir, awayê xwe-dîkirina xort û zarokan, elaqeta dê û bavan bi hev re û bi zarokan re nîşan dîkir. Bi xwe Senelman û hevalîn xwe serfiraziya Finlan-diyanê bi terbiya nîşen nuh ve girêdidan (R.N., hej. 40, 41).

Tevi ku belavkirina vê pirtûkê pişti hejmara 41'ê dîsekine ji -emê dû re sebebê wê nas bikin-mîrov ji beşê çapbûyi kare fikrek temam li ser wê hilîne. Fikra wê ji, weku me berê got, bi kurtî ev

e: Riya herî baş ji bo azadkirina welêt û mîlet; medeniye-pêşketin e.

Belê, têma ya welêt li cem Qedrî Can bi şiklîn din ji xwanê dibe. Niviskar di nivisarê xwe de rewşa jiyanâ Kurdan nîşan dike: Çawa diçin nêcîra berazan ("R.N.", hej. 48 û "Ronahî", hej. 28); Çawa mewîj û sincoqan di kûpan de

vedişerîn û ji bo zivistan hiltînîn (Serencam, "R.N.", hej. 2); dek û dolabê şêx û meleyen derewin li

Kurdistan şûnmayî keşif dike û ji mîlet re dibêje ("Ronahî", hej. 16 û "Hawar", hej. 39). Di vê manê de Qedrî Can wekû ronakbîrekî

cîyê xwe digre, li diji nezanîyê

disekine. Belê, ew kesen ne hêja

nîkarin dilê niviskîr ji welâtê wî sar bikin. Hezkirina Qedrî Can ji

Kurdistanê re digihê heyâ dereca, ku ew serê xwe bi kûçikîn zoza-nan yên gürxenêq (gûrêx) bilind

dîke: "Lê pişti ko sehê zoza-nan Kurdishanî li wir xuya dibe, gur û

tebayen din newêri bûn nêzîkî pez

bîbin... Sehê zoza-nan xweli li serê

wan dikir..." ("Ronahî", hej. 14).

Ev Qedrî Can e, girêdanê wî bi

welat û mîletê wî re ewqas xurt û

geş in. Loma li zerîbiyê, gava dûrî

welêt e, keseran dîkişîne û dinale.

Di nivisarê xwe yên li ser

rûpelekî rengîn in". ("R.N.", hej. 2). Ji bil van nivisarê wî rîz dike, em karin ji nivisarê wî yên li ber destan, helbesta "Resbelek" ji, li ser vê koma têman bihesibînin.

Ji van nivisaran, tevî ku biçuk in û hindik in ji, mîrov gelekî ji

jîyana Qedrî Can a zaroşiyê nas dike, nexasim aliyê wî yê

xemgîn jê. Diyar e Qedrî Can li

Şamê û dora wê (piraniya nivisân wî nêzîkî Şamê, li Cidedê,

Salqîn û Ziwanê hatine nivisan-din) di halekî gelekî perişan bûye.

Loma van rûpelîn xemgîn û ji jîyana xwe bi bîr tîne: "Gava meriv ji halê xwe ne razî û ji pêşîya

xwe bêguman be, dizivire, li roj-en xwe yên derbasbûyi dinere..."

(R.N., hej. 2). Qedrî Can ji halê xwe ne razî bûye heyâ dereca, ku

di sisyan ji van her çar serpê-hatîyan de xwe xwînî dike, mukur tê, ku bûye sebeba kuştina sê

hevalîn zaroktiya xwe. Di "Gu-neh" û de Qedrî Can hevalî xwe

Cemo di şikefta Bîrxêrê de di-tîrsîne. Ziravê lêwik diqete û pişti du-sê rojan bi alîkarîya çoyê Şêx Sedeqeşî derewin, ji dîlvâ ku cin ji laşê Cemo derkevin, ruhê rebe-no derdikeye.

Di "Sond" û de Qedrî Can dibe sebeba mirina birayê xwe yê dinayê û axritê, Sindikê mîrxas. Ew lawik niviskarê pêşerojê ji kûçikekî har xilas dike, lê laşê wî dikeve ber diranê kûçikê har. Sindik nexweş dikeve û dirêj nake, pişti çendekî dimire. Di "Serencam" û de Qedrî Canê zarok mevîj û êmisän ji malê didize û dibe ji Xeca çirokbêj re dibe. Dizi

Hawar, no: 1-9(M. Bekir)  
Hawar, no: 24-57(  
Ronahî, (Jîna Nû  
Roja Nû, (Jîna nû  
Nivisarê Qedrî Can yên  
ku "Hawarê" de belav bûne,  
1- Hawar hebe, gazî li pê ye" (ji bo Osman Sebî) kurteçîrok, hej.1.

2- "Gundê müava", êssê, hej. 2.  
- "Berdîk, helbesta Osman Sebî (ji Qedrîcanê canbirâ) re, hej. 2.  
3- "Silêman Beg Bedir-Xan", gotar, hej.3.  
4- "Besreka Zêrin", çirok (diyârî rîberê me ê gewre Qedrî Beg) hej.5.

# Lêkolîn

eskere dibe û ji bo ew xwe ji destê diya xwe ya sert xilas bike, gunehê diziyê dixe hustuyê nuxur yê xwe Fethî. Ew rebenê bê guneh du şelmeqan dixwe, ji tırsa û ji qehra ta digre û roja sisyan ew ji emrê xwedê dike.

Di van nivîsaran de rewşa malbata nivîskar jî hinekî ji me re bêlî dibe: diya wî jineke sert bûye (serencam û Sond); rola bavê wî di malê de ne mezin bûye (ji carekê pêve behsa bavê xwe nake, ew ji gava bav doktor tîne ser Fethî yê nexwes).

Ji alîki din ve Qedî Can rojê derbasbûyi ên xweş ji tîne bîra xwe, nexasim mayîna wî li Cizîra Kurdistana Sûriyê gelekî lê tesir kirîye. Wekû xwanê dibe, wî li Amûdê û Eyndîwerê dersdarî kirîye ("Hawar", hej. 52). Bi xortêñ Kurdan re daye û stendîye, hevaltî kirîye. Qedî Can wan rojan bi kul û keser tîne bîra xwe:

"Yek roja ko min bi wer derbas dikir

Ne dianî bîra min salê berê".

("R.N.", hej. 1)

Bi rastî, mirov kare bêje, ku ji bîrhatina Qedî Can evîna Kurdistanê bi best û çiyayê wê ve, bi her tiştê wê ve, eskere dibe. Bawerîyek bi mirov re çê dibe, ku tiştîk nikare Qedî Can ji welatê wî qut bike, ya dilê wî jê sar bike. Lî mixabin ev tişt qewmîye. Heger mirov hinekî li ser felsefe û fikra nivîskîr bisekine, wê du mirovên dûrî hev, du mirovên ji hev cuda di van nivîsîn han de bibîne. Di vir de yek ji wan momenten dîrokî, ku jîna nivîskîr guherandine, peyda bûye. Di vê momentê de Qedî Canek ji meydânê rabûye û Qedî Canekî din hatîye dewsa wî. Nivîskar bîr û bawerîyê xwe guherandine, bûye komûnîst. Ji refî welatparêzîn Kurd qesîyaye û gi-haye refîn Partiya Komûnîst ya Sûriyê û bi carekê de xwe ji wan nîrînê xwe yên berê, bêrî kirîye û kirasekî nuh li xwe kiriye:

"Ew perdeya reş tarî  
ko ji şevê reş diyarî min  
ji rûyê xwe kişand  
li ber çavê xwe cirand  
û avêt

Êdî

bi dîtina xwe  
û bi bîhistina xwe  
bi vîna xwe û bi mîjî  
bi rîve-çûna xwe ji

Ez bûm însanekî nû, pirestesê  
olek nû  
Ü di bajarê dil de,  
min ava kir holek nû...

("Ronahî", hej. 26)

Ev helbest-beyana (helbest-bernama) di 25.05.1944'an de hatîye nivîsandin. Ji wê em nas dîkin, ku ev guhertina mezin di dawiya 1943'an û destpêka 1944'an de çê bûye. Yanê wê demê komûnîstan xwe gîhandine nivîskarî me yê welatparêz, ideolojiya xwe kirine serê wî û fikra wî guherîne. Qedî Can, wekû me berê nas kiriye, mirovîkî welatparêz bû, di nivîsaran xwe de li ser êsa Kurdistana bindest dinalîya. Tevî ku ne gelekî oldar bû jî, lê bawerîya wî bi Xwedê dihat. Lê belê ev helbesta wî sînorekî dixe navbera herdu Qedîcan; yê welatparêz û yê dinî komûnîst, endamî Partiya Kominist ya Sûriyê, ku pîrsa netewî di hundurê Sûriyê de bi vê hêsanîyê çare dikir.: "Gava sosyalizm were Sûriyê, wê hemû problemen netewî û cîvâkî

bi carekê de ji xwe ber çare bîbin". Wan komûnîstan peyvîn "Kurd, Kurdistan" heyâ van salê dawî bi kar netanîn.

Qedîcan, çawa berê bi welatê xwe ve girêdayî bû, weha jî ji dil û can bi komûnîzmê ve hat girêdan. Ew jî wekû her mirovîkî şerîf bi xwe rast bû, rîk digirt, çimkî pê bawer bû. Ewî di helbest - bernama xwe de gotîye:

"Li rojên derbasbûyi, li rastîyê kevnare;

Li hevalêne hemrah, cara paşî selav kir".

("Hawar", hej. 26)

Bi guhertina bîr û bawerîyê xwe re, Qedî Can hevalêne xwe jî guherîne. Ew "rasîfîyê kevnare" û "rojên derbasbûyi" jê re nema wek berê bi rûmet bûne. Heqîqeta han bersîva vê pîrsê dide me: çîma pîrtûka "Di welatê zenbeqê gewr de" bi temamî ne hatîye belavkîrin? Xeleka dawîn jê -wekê em zannî - di hejmara 41 ê de belav bûye, ew hejmara jî di 13 ê adara 1944 an de derketîye. Helbest - bernama "Reya Taze" wekû nase di 25 ê Gulana 1944'an de hatîye nivîsandin, wekû diyar e, ferqa zemîn di nav herdû çapememîyan de du meh û deh roj in. Dûre ji bil "nêcîra berazan", ku nîsana 1944 an de hatîye nivîsandin û 15 ê gulânî di hejmara 48 an de belav bûye, 24 hejmara rojnamê derkette, têde navê Qedî Can nîne mixabin. Diyar e, fikra wî ya komûnîstî û ya kitêbê nema li hev dikirin. Ne dûre jî, ku navbera Qedî Can û Bedirxanîyan xerab bûbe pişî guhertina yê pêşî ji bîr û bawerîyê xwe re.

Pişî wê helbest-bernamê nivîsaran Qedî Can bi carekî ji meydana welatparêziyê dûr dikevin û xwe berdin meydanek din. Ew gotarek qels li ser dîroka şoreşa Çîriya Pêşîn ya Rûsyâ yê bi ser-navê "inqîlabâ sor û mezin" dînîvîsine. Înformasiya gotarê ji hin jêderen Erebî hatîye girtin û wergarandin, bê guman ji belavokan PKS ye. Ev bawerî bi min re çê dibe, çimkî hinek navdîr di gotarê de, mîna Ereb bi lîv dîkin, hatîye nivîsandin: li dewsa (Plexanof, Aksîrod, Vêra Zasûlîç, Peryod) Qedîcan nivîsîye (Bîlxanof, Aklorê, Fîra Zasolîts, Briyod). Şaşîtiya mezin di nivîsandin van navdîran de, ji tipen P,V,È,Ç hatîye. Ev tip di Erebî de nînin, lê di Kurdi û Ûrisî de hene û gava nivîskar wan mîna Ereban bi kar tîne, jêderen înformasiya xwe keşif dike.

Belê vê gotarê tevî qelsbûna xwe, karibû dawîya "Ronahî" yê bîne. Ew nivîsara dawî de hejmara kovarê a dawî de bû. Pişî wê "Ronahî" ya reben can da, serê PKS "sax be".

Ji alîyê form û janrê de nivîsaran Qedî Can rengorengone: wî pexşan (çîrok) nivîsîye; ew şayîr e ji (helbest, basnî); pûbliknîvîs e ji (wergar, gotar, essê). Bi xwe tu sînorê beli û heya dawî tesbîtkîri di navbera janrîn literatûri de nînin, belê mirov kare di xetîn pan de van nivîsaran li ser janran parveke. Min ji ev muhawele kiriye di cedwela nivîsaran de, ez hêvidarim wê şîfiyê min tê de hindik bin.

Ji bil vê yekê Qedî Can nivîsaran xwe bi şiklîn gelekî basît û hêsan, gelekî li rû nivîsîne. Zi-manê wan sîvik e, hêsan e, her Kurd kare jê fêm bike. Di avakiri-

na (Kompizîyon) nivîsaran wî de zehmetî nîne, ew jî bi hêsanî û sîvikî hatîne avakirin. Ev herdu xisûsîyet yê bin gehîn in di hemû nivîsaran Qedî Can de. Sebeba wan di bawerîya min de ewe, ku Qedî Can hunera xwe, edeba xwe xistibû bin xîzmeta armancek siyasi û cîvakî mezin: pêşî serfîrazî û pêşketina gelê Kurd, paşîye serketina komûnîzmê. Bi vê namê em dikarin bibejin, ku edeba Qedî Can edebek siyasetkirî û bernamekirî ye. Ji lewra hemû ni-vîsaran wî, wekû xwanê ye, rolek propagande yî dilizin. Nivîs-kêr dixwest bi her awayî xwe bigîhîne xwendevanê xwe, xwe bigîhîne mîletê Kurd yê nexwende û şûnmayî, da jê re awayê jîyan û xebatê nişan bike.

Vê xisûsîyetê, di bawerîya min de, ziyanî herî mezin ji alîyê hunerî ve gîhandîye nivîsaran Qedî Can. Nivîsaran wî, ji bo bigîhîn mîletê Kurdiyê li şûnmayî û kêmîxwende, gelekî bi hêsanî hatîne nivîsandin., tu kûrbûna tu bêjî di wan de nîne. Ew di wê dereca zanîna han den ne ku Kurd wê çaxê tê de bûne. Ev bawerî bi min re çêdîbe, çimkî qelema Qedî Can, wekû ji çend nimûna diyar dibe, ne gelek qels bû. Xwedê hikmeteke bilind dabû wî, loma gava baş li ser warê hunerî disekeinî, nivîsarine gelekî xurt û bi qîmet pêşkêş dike, di bawerîya min de. Wekû nimûne: Gulçîn, Nêçîra Berazan, Reya Teze, Ji Lorîya Bedirxan re. Qedî Can ev nivîsan ji dil û canê xwe nivîsîne, mîna dibejin, loma wî tê de hostayî û hunermendiyek mezin ekere kiriye. Hostayî ya wî nexasim di "Gulçîn" û "Reya Taze" de ber çav e, ku şaxîn bilindin di literatura Kurdi ya sedsa-la bîstan de.

Belê, ji xeynî helbesta "Reya Taze" tu helbesten dînîvîsînuh di van nivîsaran wî de nînin. Bi xwe min ji gelekan bîhistîye, ku Qedî Can, danerê helbesta Kurdi ya nuh e. Belê, ez vê nuhkîrnî nabînim ne ji alîyê kîşa helbestê ve, ne ji alîyê dawetipê ve û ne ji ji alîyê avakirina helbestê (kompozisi) ve. Tenê "Reya Taze" gulana sala 1944'an de bi formek nuh hatîye nivîsandin. Belki Qedî Can "selava xwe ya dawî" hem li heval û bawerî yê kevin kiribe, hem jî li helbesta kevin kiribe û dest bi nuhkîrina şîrê xwe kiribe. Lî mixabin, ew helbesten wîsa heger hebin jî, di van belavokan de çap nebûne û li ber destê min nînin. Tenê ez karim bêjîm, ku zimanê Qedîcan di şîrân de ji ewqas hêsan û serbest û şîrîn e, ne kîmî di pêşxanî de.

Ber dawî, dixwazim bêjîm, ku di vân kîmanîyê Qedî Can de, nexasim ên hunerî de, gunehkar zemanê wî, rewşa mîlet û welatê wî bû. Qedî Can bi vê manê "mirovê durust di çax û ciyê durust de bû". Bawerîya wî bi hunerî ji bo hunerî ne dihat. Huner pêşî di xîzmeta mîlet da bû, paşê di xîzmeta ideolojiya nuh de bû.

Ji ber vê yekê, çûna Qedî Can bi komûnîstan re zîyanek mezin bû ji Kurdan re. Qedî Can dewsa xwe vala hiş, çimkî qelemîn weha şîrîn û yekta di nav Kurda de -nexasim destpêka sedsalê de ne wa pirr bûn.

## Jİ GERNAMEYA MARCO POLO 2 Li Asyayê

Wergêr li Swedi: Mihemed Dehsîwar

### Niha em tê Ermenistana Mezin

Ermenistana Mezin herêmeke gelek mezin e. Dema ku meriv pêşî diçe bajarê Arzinganê (Erzîncan), meriv çav bi fabrikayê piçûk (manîfaktur)ên ku destmal û xewlîyên ji pembû yê delal ku jê re Bochasin (7) tê gotin û gelek fabrikayê hêja -ku hejmarê wan gelek in û dê nivîsandina wan di vir de gelek cîh bigre- dikeve. Her wiha li vir avgermîn herî xwestirin hene ku meriv dikare ji bo sihîta xwe ji wan gelek feyde bibîne. Xelqê vir bi piranî Ermenî ne lê di bin zordariya Tataran de dijin. Li vî welaî gelek bajar hene, lê Arzingan bajarê herî bi nav û deng e ji pîskoposekî sereke re cîh rûniştinê ye. Bajarê din ên giring Argîron (Erzerum) û Darzîz (Ercîs, nêzî gola Wanê) in.

Havînan hinek ji Tataran rojava ji bo heywanen xwe li van mîrgeyên xweş bicîfrinîn tê ve herêm; lê dema ku zivistan nêzîk dibe ji wir vedikşin. Ji bo ku hingê berf kûr û hespê wan nikarin giya yan jî em û bin berfê de bibînin û her wiha ji bo germê, Tatar diçin bi alîyê bakur ve. Divê ku meriv di ser riya keleyekê de here ku navê wê Paipurth (Baybûrt) e, hingê meriv ji Trebisondê (Trabzon) diçe Tauris (Tebrîz). Li wir ocaxa madenê zîv ku pir zengîne heye.

Li navçeya Ermenistana bi navê Ararat çiyayekî gelek mezin û bîlind e heye. Li gor ku tê gotin pişî Tofana mezin keşîya Nebî Nûh li ser vî çiyayî maye. Meriv bi lingan kîmtîrî du rojan nikare li dora çiya bigere. Ji ber ku berf li ser çîya heye û bi her berf hatîne re zêde dibe, rî nade ku meriv hilkiye serê çîye. Lî li xwarê, li ber rasta binê çîya bi saya helandina berfê ax gelek bi bereket dibe û li wir mîrgeyek têr û tijî dijihije. Ü yê ku pez an jî dewarîn xwe li wir diçerîne, dibe xwedanê mîrgeyek herî zengîn û bi bereket.

Ermenisstan li başûrê rojava digihîje bajarê Mûsil û Mêrdinê -ku dê di pêş de li ser wan bête nivîsandinê. Zorzanî (Gürçistan) dikeve bakurê Ermenistana ku li wir nêzî tixûb bîreke nefte ya vale û zengîn heye ku meriv dikare gelek barên deveyan ji wê bîrê barke. Ev neft wek melhem ji bo nexweşîyên çermê mirovan, heywanan û her wiha ji bo êşen din tê bikaranîn. Meriv dikare wê ji bo pêxistina lembeyan ji bîkarbîne. Li vî heremê nefte tenê jîbo lembeyanbikartîn û gelek xelq jî cîhîn dûr tê daku wê nefte ji xwe re bigrin.

Li Zorzanî ji qral re bi piranî Melîk Dawid tê gotin ku di zimanê me de maneya wî Qral Davîd e (8). Perçeyek ji vî welaî tê Tataran e û perçeyê ûn bi saya saxlemî û mihkembûna koşk û serayan, ji berê ve di desten mîren xweyî de maye. Welat di nav du deryayan de dimîne; yek ji wan dikeve bakur ku jêre Deryaya Mezin (Deryaya Reş) tê gotin û gola mezin Abakû (Deryaya Hezer) (9) ji dikeve rojhîlat. Dora ya ku dawî hat bahskirin 2800 mil dirje û tevî ku têkîlyîn wê bi ti deryayan ve tuneye jî ji ber mezinbûna xwe û karakterê xwe derya tê hesab. Gelek giravê wê hene ku di wan de sera û bajarê şîpehî hene; xelkê wirê ji ber wêrânkirina qrafîyeta İranîyan ku ji alîyê qralê mezin û Tataran ve hatîbû xîrakînî revîyane û di wir de bi cîh bûne. Ew yan li wir sitirîne yan jî çûne di nav çiyayîn hişk û bilind (10) de xwe diparêzin. Hinek ji wan giravan vala û qet kesek tê de rûnanê.

Di vê deryayê de nêzî ber devê çeman gelek masî û bi piranî ji masîyîn sor û mersîn(?) hene. Di daristanen welêt de bi piranî darêن çilo (şîmşîr?) û buxbom(?) peyda dîbin. Ji min re hatîye gotin ku berê gava ku qralen vê dewletê dihatine dinê li ser paşmila (pîl) wan şîklê teyrekî hebû. (11) Şenîyên (xelqê) wir wek betlan, deryavanen bê turs bûn, tîr û kevanan xweş dixebitandin û di şeran de gelek mîrxas bûn. Ew mesîhî bûn û dilsozîn dêra Yewnaniyan bûn, porêن xwe ji wek rûhanîyên welaten rojava kurt diqusandin.

Ev ew welaît ku dema Aleksandrê Mezin (Îskender) dixwest ber bi bakur ve here û nikaribûye tê de derbasbibe. Ew di alîyê riyeke asê de hat sekinandin ku alîyekî wê derya bû û alîyê din jî çiyayîn bilind û daristan bûn ku çar mil dûvedirê bû. Ü ji ber wê jî hindik kesan mirov karibûn xwe li hember temamî dînyayê biparaztina. Dema ku Îskender bi ser neket, destûr da ku dîwarekî mezin li ber devê wê bihorê bê çêkirin. Qulyayek mezin li ser da bîcîhîrin da ku ji alîyê din ve ti kes nikaribe zîr bide wî. Ji ber hîşkbûna wê û zor derbasbûna wê, jê re "Deriyê Pola" (12) dihat gotin û tê gotin ku Îskender li virê Tataran xistibû nava du çiyayan. Lî bi rastî şas e ku meriv ji wan re Tatar bêje, ji ber ku hingê kesekî bi vî navî tunebûn li wirê; lê ew Kumanî (13) bûn, xelqekî tevîhev û ji gelek milletan...

Di vî welaît de gelek bajar û seray hene. Tişenê ku jîyanê didin berde-wamkirin li vir pir bi bereket in. Her wiha li vir cawê hevrîsim pir e û hetta ev cawê hevrîsim bi zêr tê çêkirin. Laşen teyrîn sisarkan li vir gelek mezin in; şîklikî wîsa ku ku jê re avîgî tê gotin. Gelê wir jîyanê xwe bi piranî bi kîşîn-fîrotinê û bi manîfîkûrâtîfîyê derbasdikin. Ji ber ku xweza û çiyayîn welêt gelek hişk bûn û paraztina wî gelek hêsa bû, Tataran ti car nikaribûn welêt bi temamî wergirtina.

Nêzî dêreke rebenan (keşîş), rojeke cejnê ku ji Leonardê miqedes re hatîye amadekirin tiştekî wiha ecêb (şehane) çedîbe: Li qeraxê goleke ku ava wê bi xwe sor e û hawîrdor e wê riya çar rojan digre dêrek heye, lê masîyîn golê di destpêka çend rojen pêşîn de xwe mişan nadîn. Piştre roja êvara hêkesorê (paskalya) gelek masî têne xwîyakirin. Lî pişî cejnê ew disa windadibin û her wiha heta dawîya salê xwanê nakin. Navê vê golê Gola Gelukhalat e. (14)

## Cand û wêje

## Nasname

## Gerdûnîst

Dr. Misto Masto

Destê sibê ye, cînarê min i meyfiroş bi lez tê û silavê dike. Lê beriya ku ez serê we xwendevan bi hevpeyiwinâ xwe ya ligel wî bişenim, pêwîst e ez xwe bi we bidim naskirin:

Birayê we Mustefa me, li vê taxa gelêri mastfiroş im. Lewra cînarên min. Xwedê ji wan razî bema dane xwe û min bi paşnavê Masto navandine. Û ji xwe cînarê min i herî nêzîk ê meyfiroş e. Her roj serxweşya wî bi destê sibê re û beriya firotinê dest pê dike.

Min jê re go:

-Xêr e gidi, ev ci kef e bi ser devê te ketiye? Mîna ku te li xurîni denek mey vexwaribe! Ev ci pirtûk e di destê te de ye?

+Xêr e? Ma dê xêr ji kuderê be lo û hê te ev pêşgotina seyr ya hevalê me yi "dikandar" nexwendiye?

-Hella, hella! Ev "çend gotin" ek nû ye, yan bi rastî pêşgotin e?

+Vê carê "çend gotin" wek pêşgotinekî ji bo pirtûka "şirîkê" xwe di danîna kevirê bingehîn ê wêjeya Kurdi ya nûjen nivisandiye.

-Ezê peyva te bi şekir bibirim. Tu li ser kîjan "şirîkî" û kîjan "nûjeniyê" dipeyiwi û...??

+Tu ji li min bibuhir ku vê nezaniya te protesto bikim, wa dixuye ku tu dûrî tevgera hunerî û edebî û çandeyî yi, bi rastî careke dî ez dî ji te bixeyidim!

-Ne bixeyide û ne ji peşkîn gi-reza xwe bi ser min de bireşîne, wek ku tu dizanî cînar, ez bi tevgera "mastevi" ve mijûl im!.. De ka em vê pirtûkê bibînîn lo:

"Mehmet Uzun, Hêz û Bedewîya Pêñusê"

+ Tu bawer dikî ku vê pêşgotinê serxweşî ji serê min firrandiye! Lî bi rastî ez dixwazim ji te bizaribim, ma gelo armanca van pêşgotinê ku bi rewşa Kurdistanê ya kevin û ya nû destpê dîkin ciye?

-Cînar! Ey Cînarê ku her û her li ser hişê xwe ye! Rewşa Kurdistanê bûye wek benê cilraxistinê, ev kesana cilêna xwe yên qirêji dema ku pêwîst be" li ser raxdixîn.

+ Anuha ez têgihîstîm! Lî tiştî herî balkêş ewe ku hevalê me yi "Dikandar" di destpêka pêşgotina xwe ya giranbiha de, ne edebiyata me i kilasîkî û ne ji ekola Hewarê ber bi serê wî de dicin û dibêje:

"Tenê çend berhemên stuxwar ji me re hiştine.." Ma gelo wateya vê hevokê ciye?

-Pir hêsanî lo .. Ez ji te re bê-jim ci ye? Dixwaze ji xwendevan xwe yên bêhejmar re bêje ku edebiyata Kurdi ya rastîn bi berhemên min û bi yên "şirîkê" min M. Uzun destpêkiriye..

+ Hey wax Eyşana Elî... Ê ma heqê me nîne ku em ji rexnegirê xwe yi "stûrast" bipirsin : Eger pirtûkxana Hawarê "stûxar" be,

cîma "şirîkê" te, romannivîsê bê hempa, yek berhem ji berhemên pirtûkxana Hewarê nehîstiye ku nedabe ber talana pénusa xwe mebesta min pénusa bîhêz û bedew e! mina ku ew pirtûkxane bêxwedî be, an wa gûman dike ku ev rûpela reş hat pêçan û ji bir kirin !!

- Erê rast e wek mast e!

Lê ya ji wê xirabtir ewe ku poz bilindiya "pesingirê" me bêsinor berdewam dike. Ma tu temaşe nakî çawan dibêje ku şirûkê wî M. Uzun: "Mîna Celadet Bedirxan" Digel ku "pesingir" ê me bi xwe ji hê nizane ku C. Bedirxan ne di bîre da xeniqi ye!!!

+ Hawar e, hawar e ey xwedî û berpirsyarê Hawarê !! Hema ezê destê xwe jêkim ku vî "Dikandari" berhemek ji pirtûkxana Hawarê xwendibe ! Ma ne di pirükên wî de ev yekaya xweş têt xwiyanîkirin.

- Bese Xwêdê ji te razî, bise ez vê movikê ji te re bixwînim, Ha wa rexnegirê me bi destê xwendevan reben digre û wî dibe cem destpêka cîhana afirandina M. Uzun û....

+ Bibûr e ku ezê peyva te bibrim. Gerek Tu bêjî "gerdûna afrindina M. Uzun" A nuha pişti çend xêzan tu yê bizanibî cîma ez wilo dibêjim!?

- Ha ha... lê bi gişti "Pesingir" ê me dibêje ku "şirîkê" wî niviskariya xwe bi navê: M.F Baran û bi helbestê dest pê kiriye. "Hetanî ku hêdî hêdî ji helbestnivisandinê bi dûr dikeve."

+ Wey sed hemd û sukîr ji Xwedê re ku ji nivisandina helbestê bi dûr ket... Xwezika ji nivisandina romanê ji bi dûr bike-ta?

- Lî çirok ne wilo ye cînar! F. Cewerî dixwaze ji me re bêje ku, binêrin! ne ez bi tenê ji helbestnivisandinê bi dûr ketime û berî daye edebiyata "nûjen".

+ Ma gelo helbest ji ne ji edebiyata "nûjen" e?

- Sedî sed cînar: ji xwe F. Cewerî dixwaze wî bêje, çunkî li cem wî helbest wek liskekê ye, an ji qonaxa ciwanîye ye û gerek niviskarekî xwînsivik "mîna wî" wê qonaxê derbas bike. Lî em wek xwendevan berzûri F. Cewerî dibin ku vegere nivisandina helbestê û ew ji destaneke nemir mîna destana "Mirina Egidekî" ji me re binivisine û...

+ Ü bila Zeüs ango Homeros ji te razî be ey danerê kurteçiroka Kurdi! Amîn!

- De hela tu temaşekî bê ci nivisandiye:

Dibêje ku romana M. Uzun "TU" di sala 1974'an de hatiye belav kirin.

+ Di baweriya min de ev şasitiya çapê ye....

- Na cînar na! Wa dixwiye ku hê ji tu serxweşî, çirok ne bi wî awayî ye... Ma cîma şasiti li ser berg ji dûbare dibe. Eger şasiti ya çapê bûya gerek sala 1975'an hatiba nivisandin. Romana "TU" di sala 1985'an de hatiye nivisandin û ronî diye. Di baweriya min de

çirok bi şarezayî di navbera herdu "şirîkan" de hatiye hûnandin da ku rewşenbîrên me yên li welêt pê bixapin. Ne dûr e ji cînar! ku sibê hinek rabin û bêjin ku M. Uzun romana xwe "Ya Pînekirî" di girtîxanê de dest pê kiribû!!

+ Mebesta te ku ew dê parsa hesten gelê me yê perişan berd-wam bikin û...

- Piçekî rawest e! Ev ci ye li vir? Mir F. Cewerî dibêje ku "şirîkê" wî M. Uzun: "Di gel pîr asteng û zahmetiyan, wî karê xwe yê niviskarî yê domandîye.." Hî... hî... hî... Çavên min bawer nakin... Tiştekî naeve serîyan.. Binirê yaho..."Pîr zahmetiyan" Yaho!

+ Beriya te min ji xwendibû. Dengê kenê min gihaştibû gu-hen... Gerdûn!!!

- Ma kûrtejiyana F. Cewerî ya di hejmara 4'an ji kovara wî ya gi-ranbûha de nayê bîra te cînar! Ma ne ew ji li ser jiyan û xebata xwe dipeyive û dibêje: "digel pîr zahmetiyan"

Bi rastî mirov di cih de niviskarê İspanyayê tîne bîra xwe, niviskarê ku pişti sala 1939'an li Fransayê bibûn pena-ber, ku çawan li kuç û kolanê Parîsê sergerdan, rût û birçî dige-riyani.

+ Yaho... Ha ho ey kolanê Stokholma zorbaz, ey kolanê tarî û sar, we ci bi serê niviskarê me yê rût û birçî kâriye?!

- De ka em xwendina pêşgotinê bidominîn lo! "Pesingirê" me nîrxke bê mînak dide nivîsîn "şirîkê" xwe ne ji alî huner û afînadinê ve, lê çunkî bi Kurdi hatine nivîsandin. Wate herkes dema ku bi Kurdi romanekê bi-nivîsine dê ji Yaşar Kemal ji gi-ranbûhatir be?

+ Yaşar kemalê "qeşmer" ê ku romanê wî bi 20 zimanân hatine wekerîn. Herê wek nimûne lo... û "pesingirê" me selafîyên xwe ligel pénusa M. Uzun berde-wam dike:

Ji bo avakirina edebiyata nûjen "pénusa" xwe li ser kaxizê çerixand.

- Tu dibêjî "çerixand"?

+ F. Cewerî wîsâ dibêje ne ez: di wicdanê te de cînar eger piçekî qabilîyeta nivîsandinê li cem miro-veki hebe dibêje "çerixand" ???

- Herê birzî, edebiyata nûjen! lê eger devê te bigotana "nûjen" neyê çerxandin, êdi edebiyata Kurdi qet bi pêş naakeve!

+ Ha va em gihiştin kakila vê pêşgotina bê serûber, va em gihiştin mîzgîniya "pesingirê" me ji bo xwendevan.

"M.Uzun fro bi giranî li du pîvanîn edebiyatê yê gerdûnî ne"

Yanî ji anuha û pêve em dikarin M. Uzun bi "Gerdûnist" binavînin?

- Bêguman e! Lî tu dikarî ji min re bêje cîma rexnegirê me na-bêje "Cîhanî" lê dibêje "Gerdûn"???

+ Bi rastî serê min ji van pir-san re ne vala ye, ka bine bê tu çi dixwazi, bêje û temam..

- Bêhna xwe fireh bike ezê ji te re bêjim: Çinkî : Cewerî wek ku tu ji dizanî di hejmara çaran ya "Nûdem" ê de wek niviskarekî bê payan xwe pêşkî me dike, her weha tu ji dizanî ku di van rojan de hevpeyiwinâ wî pir bûne û ...

+ Xwedê ji çavên hesûd û zik-reşan bisitîr ne.

- Amîn.. amîn wek ku min gotibî di wê hejmara "Nûdem" ê de dibêje ku lîseya Swêdî wergirtiye û pîskolojiya zarokan xwendîye, her weha şarezayîa xwe di zimanê

İngilizî de ji dide xuyanîkirin. İcazanîna wî ya pir alî wî gihandîye baweriya ku ihtimale ku li ser stér-kne ditir jiyanine mirovane hebin. Eger ev ihtimal di pêşerojê de pêk-hat, bêgûman dê pirtûkên "şirîkê" wî M. Uzun bên wergerandin ser zimanen xelkên wan stérkan, ica edebiyata wî gerek "gerdûnî" be ne ku "Cîhanî" be.

Ma dengê min tê te lo!

+ Erê... erê, ez piçkî ji dest xwe çûm, min wa xeyal kir ku ez li ser pişta gemiyeke esmanî me û ji xwe re li dora gerdûnê digerim!

- Xwedê ji te razî, ma gemiye esmanî ji bo çiye? va "Buraqa Hez-rettî M. Uzun" dê me li dora gerdûnê bigerîne !!

+ Te tiştekî pir xweş got. Lî min xwest ji te bipirsim; ma ev M: Uzun bi ci zimanî dinivîsine?

- Pirsa te pir seyr e cînar.. Bi Kurdi. Xwedê giravî bi Kurdiya herî modern. Bi Kurdiya ku ba di bere naç!

+ Modern! çawa yani?

- Hêsan e malava ! Di şûna ku tu bêjî "Tîrs" gerek tu bêjî "Tîrs û Xof" ..!

+ Ma "xof" ji ne "tîrs" e?

- Belê .. belê.. Tirse lê bi Erebi ye !!

+ Tu dizanî , ta nuha ji min weye ku M. Uzun bi "Farisi" di-nivîsî.

- Hêqê te ji heye cînar ! Carca-ran çend peyvîn Farisi bikartîne, jê weye ku bi Kurdi ew peyv nîn in...

İca bi rastî cînarê delal mirov tênahîjê dê çawan Uzun û pesin-girê xwe edebiyata me nûjen bi-kin, dê çawan bi alî modernîzmê de deh bidin û bi taybeti bi vî zima-nê, sedsalen navîn !!!

De ka em vegerin pêşgotina "Doncîwan" ê xwe... Ev navê seyr çine ? Carlos Fuentes ? Faulkner ?

Temase ke çawan van navan bi navê "şirîkê" xwe ve girê dide, da ku me bixapîne û ji me re bide xuyakirin ku wî ji berhemên wan xwendîye !!

+ Mesele pir hêsan e Cînarê Masto !

Veger rûpela 138 an tu yê bibînî ku çawan M. Uzun bi xwe ji navê wan û yên çend niviskarê dîtir tîne zîmîn, ji xwe hergav anîna wan navan bê mûnasebete, tenê ji bo ku xwendevan bix-apîne û ji wan re bêje: De binêrin ez ci reşenbîrekî mezin im!

Tiştekî dî ji, da ku navê niviskarê Kurd bi wan navan bi-nixumîne, niviskarê Kurd yê ku M. Uzun romanê xwe bi nivîsen wan dixemilîne. İca wer û li şirovekirina F. Cewerî temaşike. Di baweriya Firat de ku ev yekaya vedigere ser pir xwendîna "şirîkê" wî "pir dixwîne" ..

Bijî her bijî.. Dikandaro... Niviskaro !

Ez bêhenek dibêjim ! Ê de cînar ji xwe re li vê meselî binêr bê çiqasî balkêse! Rexnegirê me wek mînak negotiye "pir dixwe" an "pir radîz" an "pir peran xerj dike" Lî wek Doktorekî jêhât "Dr. Poloço" tilîya xwe datîne ser koka birîn û mîna "Newton" der diçê û diçire:

"Min dît.. min dît" Erê.. pir xwîn tu yê bibî niviskarekî modern û romannivîsekî gerdûnî..

+ Ci bir û baweriyeke durust..., bi rastî ev bir û baweri, xwendîye xwe ne li dinê û ne ji li axretê rûres dike!

- Hetanî vê kîlîkî mişteriyek ji çiye nehatiye cînar! wa dixuye ku hê zû ye... Anuha ne wexta fir-

otina mast û meyê ye. De ka were vî qeymaxê ku cînarê te - Misto Masto- çekirîye bixwe.. Xweşê ? Kêfa te jêre hat?

+ Erê bi rasî tama wî xweşê.

- Lê tiştî jê xweştir "Tama" nivisandinê M. Uzun e , bi taybeti dema ku werdigerin zimanen dîtir! Çima tu wisa ziq li min temâse dîki ? Ez ne ji ba xwe dibêjim.. F. Cewerî li ser gotarek şirîkê xwe wilo dibêje, wa dixuye ku hatiye wergerandin ser simanê Elmanî û İtalî û ...

+ Yanî "Pesingirê" me van zimanen jî dizane ? Ma İngilizî û Swêdî û Tirkî û "Farisi" ne bes in

- Diyare ku ne bes in.. De ka dev ji sêniya qeymax berde û were em bibin bê çawan rexnegirê me bi xwesipartina li ser wergera nivisa M. Uzun ji bo wan zimanen, şirîkê xwe dike niviskarekî gerdûnî..... Ma ne tiştekî seyr e cînar! Çawan romannivîsek di deh salan de ç

Beşek ji romana M. Efif Huseynî

## Di Sala 1988'an de li bajarê Amûdê

M. Efif Huseynî

Wek tem û moraneke teng ewrên havinê xaniyêne wê yên nizim derbas dikirin.. Qederan di esmanê wê de dilistin. Ji çayxaneyê dengê zilaman req û giran dipeliya û çingeçinga kevçiyen piçük bilind dibû daku çarenusa bûnewerên şevê û şasiyên herdemiyê nîgar bike. Taristaneke ebedi xwe berdida hundirê zilaman; dergehê cam i pan derbas dike; xwe davêje ser maseyan, xwe davêje koşeyen vala ... Tarisatn ji ali rojhilat û aşê kevnar ve tê, berê xwe dide bakur, çola bakur û mayinêne bakur û bîlindahiya wan çirênu ku "Tirkân" li seran serî sinor çandine.

Taristan ji aliyê başsur ve tê, başsur bi goristana terr ya ku bi kar û barêne xwe û bi "Girê Şer-mola" û bi wan qehfênu ku nû ji gir hatine de ranin mijûl e. Dibêjin ku di vî girî de leşkerên İskender hatine veşartin lewra gelek qaf bi sîpibûneke kevnar û bi kortalêna çav yên pan ji gir derxistine.

Şeve, gumlekên zilaman û ramanen wan ên tevlihev derbas dike, lewra xwe bi axînen nazdar li ba dikan, axîne ku di mîraniya wan de hatine veşartin.

Anuha desten xwe ji axa kuştiyên sîfirînî şüştin. "Hesenê Gunreş" bi lez û bez ligel qazme û çavê xwe i bitenê dihat, bi naven xwedê dike kurtepist,

sê çarko-  
çeyen dirêj  
li ser erdê  
nîgar dike,  
û hêdi hêdi  
di erdê de  
diçe xwarê  
û digot:

-Ezê kûr  
bikim da-  
ku seqema  
şevê dû-  
riyê hest  
nekin !

Bejna  
wî di erdê  
de wenda  
dibe, li ser  
herdû qî-  
raxan axa  
hênik  
kom di-  
be, axeke

dilovan, di dudiliya xwe de xeniqî ye... Axa "Hesenê Gunreş" e, mîna bûnewerekî jîndar bi wî re dipeyive, wê rojê li bakurî "Amûdê" berzûri wî dibû...

- Alîkariya min bikin daku ez derkevin.

Bi lerzeke sar tê rapêçandin, ji nişkê ve dikeve bîra wi û ji xwe re di-  
be:

- Ma hema ku yek ji kuştiyan kurê min bûya, xwedayo ma ji bo çi ?

Dilê wî têt guvaştin, ji çavê bitenê hêsrên germ diherikin, na.. na ji herdû çavan rondik dibarin, ji çavê piçük i girtî û ji yê diwemîn i aw-  
irtij û vekiri, çavê ku gelek caran axa germ ji xewê hişyar dikir...

Çend çira li jîr in, û çendine ditir ji li ser komikên axê ne û rezek ji çiren dijwar li ali bakur e... Hêrsa dijwar ya kurd û Ermenan e. Bakur, ronahiya sînor ya ku ji ali leşkerên "Tirkân" ve hatiye çêkirin û li ser Fikandina tirêna rojhilat i bezok û barêne réwyan û dilbijandînen wan di vagonan de hatiye çesipandin. Bakurê ku di navbera barêne qaçax û mayinêne paşmayî yên ku şevelê "Sedo" yê evîndar bi wan hatiye kuştin de, hatiye bi cih kirin.

Dema ku darbestan nêzîki gorran dikin çiran vediciniqin. Wê êvarê hemî xelkên Amûdê derketibûn oxira kuştiyên sîfirînî, nûçeya kuştina wan pir bilez belav bûbû. Do êvarê gulleyan dest pê kiribûn û iro toza hûr ji nav piyan diherikî û ji jor ve.. Roj dadikeve, nêzîki hersê terman dike, dihingive konê ku li ser wan hatiye vegirtin... Ne sîber bûn, lêbelê şîniyeke rewan bû bi ser xwîna zuha û devêne vekirî de hatibû rijandin.

Hêji xelkên Amûdê tê, zemîn disincire û germtir dibe, tirs di nav xelkê de belav dibe, bîna şewatê ji hersê terman difûre, hersê laş hatin bi ser hev de, req bûn, zemîn bi hêsiya dawîn ya "Hesenê Gunreş" hat xemilandin. Hersê laş, germ, xurt û sîfirînî hişk bûn, bûn sê peykel...

Xwedayo! îca emê çawa wan vesîr? xelkên Amûdê bêdeng li haw-  
irdor hersê goran rawestiyane û zîqezîqa pêñusa niviskarê dadgehê ji hat birîn. Dr. NAFIZ ê ku cara dawîn birînen wan mist dabû centê xwe li cî hişt. Di wê kîlîkê de..., di navbera matmayîn û lerza xelkê de, kulfikine zer di şûna gullan de şîn hatin, hêdî hêdî bilind bûn û bîşkivîn; Ciwan û mişt dilopên hîbrê û bi nixumandina bûyerê ji bîşkivîn. Li jîr esmanê Amûda 1988'an, sal di ber gorrêne wan û naven wan yên bi tîpen ciwan û xweşik nivîsandî, dibuhurîn.

Li jîr esmanê Amûda 1988'an, tişa dawîn ya ku ji gulleyan mabû laşen nûha derbas dikir li nik rondika "Hesenê Gunreş" û axa wî ya xil-  
maşbûyi.

## KEVIRÊ ROJÊ IV

Çend awir di zikê bîrê de veşartîne,  
çend awir in her ji destpêkê de me dibînin,  
awirvedana li zarokekê ji pîre-dayika ku  
di nexwirye xwe de bavekî ciwan dibîne,  
awirvedana li dayikekê ji keçekê koçbarbûyî ku  
di bavê xwe de lawekî piçük dibîne,  
çend awir in ji kûrahiya jiyanê li me temâse dikin  
ew awirana xefk in, mirinê ji me re vedane  
an berevajî wê ye: Ma gelo ketina di nava wan  
çavan de li jiyan rasteqîn veger e?

\* \* \*

Eger bikevim û vegerim, xewnê bi "min" bibînim û  
çavine ditir ji pêşerojê xewnê bi min bibînin,  
jiyanekî ditir, ewrine ditir, eger bi mirinek dî bîrim!

- Ev şev û ev kîlîka ku her û her dibîşkive û ji min  
re dibêje, besî min in:

Ez li kuderê bûm, ez kî bûm, navê te ci ye, û  
navê min ci ye;

ma gelo berya nuha min bernâme ji havinê re  
amade kiribûn -ji bo her havinêkê-  
berya deh salan li "KRISTOFER STREET", li gel "FILIS"  
ya ku du xemzeyen wê hebûn û sivandîlce (çükên beytikî)  
dihatin da ku ronahiyê ji wan vexwin?

Ma gelo li "ELBASYO DE LARİFORM"

"KARMEN" ji min re gotibû:

"-giraniya ba nîn e, li vir herdem çirya pêşin e"  
an ji yekî ditir e ku min ew jibîrkirîye gotibû  
an min bixwe ev peyv çêkiriye û tu kesî ji min re negotiye?

Ma gelo tu di şeva "WAKZAKA" de mezîn û  
mîna keskî tarî bi rî ketibûyî,  
bi tenha xwe mîna bayê şet dipeyivîm û dema

ku ez digîhiştîm odaya xwe -jixwe her gav odayek e-  
ma gelo neynikan ez nasnekiribûm?

Ma gelo me ji xewxaneya "VERNÎT" û ditibû ku çawan  
berbang li gel darêne şahberûyê semageriyê dike.  
"em pir dereng mane"

ma gelo dema ku te porê xwe dişikinî te wisa gotiye û  
min ji şûnşopêne xwînê li ser diwêr didit û nedipeyivîm?

Ma em bi hev re hilkişîyan ser serê kelehê, ma me  
êvara ku xwe ji ser kolanê dida ali ditibû?

Ma gelo me tirî li "BİDRAT" û xwariye? Ma gelo me  
kulîkîn gardînyayê ji "BARÛT" û kirîne?

nav in -şûnwar in,  
kolan û kolan in, rû ne, gorepan in, kolan in,  
Istgeh, seyrangeh, odayen bi tenê,

şûnşopâ xwînê li ser diwêr, kesek xwe şeh dike,  
kesek li tenîsta min distirê, kesek cilêne wî li xwe dike,  
ode ne, şûnwar in, kolan in, nav in,  
odeyên "MADRÎD" a sala 1937 an

li gorepana "ANJ DO LEVAM" pîrekan tevin çedikirin  
û bi zarokên xwe re distiran û

pêpîka xeterê lêda, çend qîrîn peyda bûn  
û çend xanî di tozê de melisîn, bircen herifî,  
enîne bi tifê qirêjbûyî, ü babelîska herdemin ya motoran:

herduwan xwe rût kirin û hevdû herbêz kirin  
da ku bergiriya para me yî ebedi bikin  
para me ji demê û ji behîşte diparastin, da ku

bihingivin rehîn me û vegerin dagîkirina "xwe" yên me, da ku  
mîrata me ya ku dizîn jiyanê beriya hezar sedsalî

bi kotekî ji me sitendibûn, li me vegerînin,  
herdiwan xwe rût û hevdû herbêz kirin çinkî

rûtbûna hevdûgirî demê diçirîne, ü bi bêgunehîyê

têt xemilandin, tu tiş nahingivê,  
xwe rûtkirin vegeriya destpêkê, ne tu heyî û ne ez,

ne sib û ne do û ne ji nav hen in, û ne ji du  
rastî di laşekî de peyda dibin,

tenê giyanek, bûnewerekî giştî...

Odene bê cir li bajarê

ku nêzîkahî li binavbûyinê kirine, ode û kolan,  
naven wek birînan, pencereyên odaye raseri odene

ditir in, ku bi heman kaxezên diwaran pêçayî ne,  
ku zilamek di gumlek de rojnameyê dixwîme,

ku jînek cilan utî dike, odaya vêketî ya ku çequlêne

dara xoxê serdana wê dike, û odaya ditir,

li derive hêjî dibare, hewşek û sê zarokên zingargirtî,  
ode ne wek keşîyan di kendava ronahiyê de li ba dibin,

ode ne di bin deryayê de:

Ü bêdengî bi pêlîn keskinî belav dibe, her ku destê me  
bihingivê tişteke wek fosforê diçurise,

gorrine payedar, wênenê kerimî, berrine veçiryayî, xefk û daf,

zindan, qubîn efsanewî, mirîşkxane û odayen bi hejmar,

tev tênhuştîn, tev dirifin, her tiştekî bel ewrek e,

her dergeh bi ser deryayê de dike, û ba, û her mesefek

vexwandinê, tev mîna guhkîn şeytên girtîne, bêhûde ye

ku dem wê dorpêc dike,

ne dem heye û ne ji diwar, valahî ye,

valahî ye,

desten xwe vek!

Van xêr û bêrân biçin! Meyweyan bidehev!

Jiyanê vexwe! Xwe li bin darekê dirêj bik!

Avekê vexwe!

Oktavio Paz



Jiyan û berhemên  
O. Paz

1943-1945: Li Amerikayê dijî. Helbesten Yêts, Pawend û Kamincis pirr bala wî dikşînin. Rober Frost û Kaminçis û Pawend ji nêzikahî ve dinase. Û di sala 1946'an de beşdarî endematiya rêxistina diplomasî ya welatê xwe dibe.

1946-195: li Parisê dijî. Peywendiyê w xwe bi surealizmî re xurt dike. Brêton û Mişo dinase û beşdarî belavokên surealizmî dibe.

1950: "Laberênta" "Tenhatiyê" belav dike. Di vê pirtûkê de bi awakî dûrûdirêj li ser rewşa civakî û mirovî ya Meksikayê radiweste. Herweha "Baz e an Roj e" pirtûkê helbestan çap dike.

1952: Serdana Japon û Hindistanê dike. Li ser wêje. çand û felsefeya Rojhilat radiweste û beşeke jê belav dike.

1955: Vedigere welatê xwe û li Zankoya Meksikayê mamostatiyê dike.

1956: Pirtûka "Kevan û Mandolin" belav dike. Di vê pirtûkê de bîr û baweriyyê xwe li ser ezmûneya helbestî û peyva helbestî tîne zîmên. Komikek şanogeriyê bi navê "Helbet bi dengekî bilind" dadimezirine.

1957: Balkêşirin berhemâ xwe çap dike. "Kevirê Rojê"

1959-1962: Vedigere û li Parisê bi cih dibe. Di sala 1960'ı de çapa pirtûka xwe "azadiya merckirî" careke din dubare dike; helbesten xwe yên berî sala 1958'an di vê pirtûkê de belav dike.

## Dimilki (Zazaki)

# ŞAK Ü PIRE

Arêkerdex: M. LİCOKI

Tiya bî û çinêbî babîke û hîrê hebî lacê xu bî. Babî tirt kono, zirt mireno. Verî mergê xu wesi keno vano:

-Lacê min, şima ci ray nêşorê serê Koy Qiramekan (1) nêçir (seyd).

É vanê: -Nê nê.

Çendeyke ser o vêreno ra, birawo pîl vano:

-Ez şina nêçir.

Biray bînî vanê: -Bira, nêbeno. Baboy wesi kerda, vato "meşorê serê Koy Qiramekan nêçir".

Kenê nêkenê, tede nêqedênenê. Vano:

-Nê! Kafirê Homay kişte bo ez o şinî!

Wirzeno tîr û kevanê xu gêno û verê xu şano serê Koy Qiramekan.

Şino serê Koy Qiramekan, hende vîneno xezalêke ver wirzena we. Ha tiya ha haca, xezale mixarayike ro şina war. Ew zî dim a şino war, hanêno (hawnêno) pîrêke û keynayke ha y (hanî yê) rûnişte y. Pire vana:

-Lacê min, kerem ke, bê serê pelase de roşe.

Lacek nişeno ro. Seyîn nişeno ro, kulpô mebreqe ra şino war.

Birawo mi-yanîn vano: -Biray ma sî û niyame, hela ez şinî serê Koy Qiramekan ba-nê, ez ê nêvînena.

Birawo qic va-no: -Baboy wesi kerda, meşo serê Koy Qiramekan.

Keno nêkeno, goş pa nêkono. Tîr û kevanê xu gêno û şino. Şino serê Koy Qiramekan, ew zî hende vîneno xezalêke wirzena we. Xezale şina, ew zî dim a şino. Xezale mixarayike ro şina war, ew zî dima şino. Hanêno pîrêke û keynayke ronişte y. Pire biray miyanin ra zî vana:

-Bê serê pelase de roşe lacê min.

Ew zî nişeno ro û cor de mebreqe ro şino war.

Namê biray qicî Şak o. Şak vin-denô, çendeyke vêreno ra, biray miyanînî ra zî hesêke nêvecêno; fam keno ku çike hamew serey ê zî. Wirzeno xu girêdan, tîr û kevanê xu gîno û şino serê Koy Qiramekan. Hende vîneno xezalêke ê ver wirzena we. Şak xu rê vano esto çînyo ena xezal a ku çike ardo serey wîrdi biranê min. Xezale şina, Şak zî dim a şino. Şinê, şinê, xezale mixarayike ro şina war. Şak zî şino war, hanêno pîrêke û keynayke ronişte y. Pire te ra vana:

-Lacê min, kerem ke, bê serê pelase de roşe.

Şak vano: -Nê dada pîri, ez xu rê etiya serê erdi de nişeno ro.

Ü ewca miyanê çikalan de nişeno ro.

Bena şewe, wextê rakewtişî yeno. Pire cay xu finena ra, verê cay xu de cay keynay xu finena ra, wetê keynay xu di zî cay Şakî finena ra. Pire keynay xu ra bi dizdi vana:

-Ez o emşo Şakî sere bibirmî. Ti serê sibay (meşde) mi rê birxul pewce, hêlik û gunikanê cê bikere verê birxulî û biyare verê cite. Gava bena kurrûpistê Pire û keyna, Şak fam keno ku go çike biyarê sere. Şak vindeno heta ê konî ra. Wirzeno cay keyneke anceno beno cay cay xu, cay xu zî anceno cay cay keyneke.

Pire bişewe bi xu hesêna, wirze-

na kardê xu gêna, pix pix keyna xu sere birnena (a vana qey Şak o) û vana:

-Keyna!

Şak vano: -İmm.

-Hani yo min Şak sere birna.

Şak vano: -İmm.

Vana: -Ez şina cite.

Şak vano: -İmm.

Vana: -Ti mi rê birxul pewce, hêlik û gunikanê cê zî ver kere û mi rê biyare verê cite ha!

Şak vano: -İmm.

Vana: -İmm û quzirkurt! Tamarê mergî to rê hamiya? Ez se vana, a vana "imm". Hani ya ez şiya.

Axirkî Pire şina citê xu girê dana, cite kena. Roc yeno hele, nanê cay nîno; roc yeno nîmeroc, nanê cay nîno.

\* \* \*

Ma bêri Şakî ser. Şak wirzeno pelase keno berze, hanêno ku binê pelase de mebreqêke esta. Şino war hanêno ku heme estey îsanan ê. Şak wirzeno birxul pewceno, çîrbülikan û çicikanê keynay cay tera keno, ci rî pewceno, keno serê birxulî. Qatêke cilanê keyneke dano xu ra, taştê birxulî gîno û şino, hema Pire ra dûri yo, ven deno, vana:

-Dada Pîri! Teşkilat hamewo. Zêrr û mecdî ma çâ yê? Ez heqê teşkilatê ma bidî.

Pire vana: -Ma qey çimê to kor ê? Ti nêzana zêrrî binê arrê gay Qîri de y, mecdî zî binê arrê gay Şemî de y?

Şak hema nanê Pire ewca nano ro û şino binê wîrdi arran zî dano a, zêrran û mecdayan veceno, keno heqîbeyke, erzeno ra xu mil û yella şino. Ha gidi ha ku Pîra merdim-were ra bixelesyo.

Pire zî vana "de ez o dîrê serey şinî û bêri hema ez o nanê xu borî". Nişka ve ra kono vîrê cay, xu rê vana "keynay min cay zêrran û mecdayan zanayne, çîrê mi ra persay? Eno Şak nêbo çîke biyaro serey min?" Gayanê xu vindarnena, yena verê nanî, hanêna hahoo ci baniyo! Tef û talê keynay cay ci rî kerdê verê birxulî. Leze kena, pey ra kona ra Şakî dim a, heta yena keye, hanêna ku zêr û mecdî zî şiyê. Pey ra kona ra Şakî dim a. Ha tiya ha haca, heta nizdikî ro ci kena, Şak kono ra we verê Pîrdê Ad û Toban.

Pire vana: -De şo! Welle ti xelesiy. Min ad kerdo ku ez nêkona we verê Pîrdê Ad û Toban.

Şak şino keye. Xebere Padişay rî şina, vanê hal û hewalê Şakî û Pîra merdimwere ana wa. Padişay şiraweno dimay Şakî, vano:

-Şorê mi rê Şakî biyare etiya.

Şinê ven denê Şakî, vanê:

-Padişay vato "wa bêro etiya".

Şak şino huzûrê Padişay. Padişay rî serebûtanê (2) xu û Pire ser ra heta bin vano û vano:

-Firaqê Pire zî zêrrînî bî.

Padişay vano: -Lazim o ti şorê firaqanê zêrrînân ê Pire mi rê biyare.

Şak vano: -Ez o şeyîn şinî? Ez şinî go Pire min boro!

Padişay vano: -Ya ti go şorê ya ez serey to tera kena!

Şak mecbûr beno wirzeno şinô kê Pire. Hanêno ku Pire ronişti ya.

Pire çim ginena Şakî, vano:

-Min ti 'ezmanan ra waştê, Ho-may ti 'erdan ra day min.

Şak vano: -Dada Pîri, xu ra ez ha-



miya ku ti min borê.

Pire wirzena ku Şakî boro. Şak vano:

-Dada Pîri, la enka nêbeno ti min borê. Goşte min heme lançik o, tehmêke nêdano ra fekê to.

Pire vana: -La ez se kerî ku tehmido ra fekê min?

Şak vano: -Bîya çewres tenî rî birxulo rûnin viraze, bike çewres lengeriyan zêrrînan û kewçikanê zêrrînan ver de rûne, heme ez o tenî borî go goşte min bibo zey ligerî (donin, vezdin). Gava ti mi borê, wa ana don dorê fekê to ra bero war ku ti tehm tera bivînê.

Pire leze kena, ana birxul pewceno, mirdî rûn kena ci û kena firaqanê zêrrînan, kewçika zêrrîne ver de nana ro û vana:

-De bo.

Şak vano: -Dada Pîri, de şo mi rî awa serdine biyare, ez birxulî ser o borî ku nhêliyo heta ti min borê.

Pire vana: -Ez ci firaq berî pê aw biyari?

Şak vano: -Hema a serradî bere.

Pire serradî gîna şina. Seyîn kona teber, Şak wirzeno firaqan derqiloçê 'erdi keno, birxulê cînân rişneno; firaqan û kewçikan keno zerey hebêke çiwalî, erzena ra milê xu, yella.

Pire zî serradî çiqa kena binê aw



ro, bera pirre; kena berze, aw tera yena war, serradî bera venge. Pire tûmananê xu vecena, erzena binê serradî, reyna aw kena ci, heta piçêke nata yena, reyna serradî bera venge. Narê (enaray) perênê xu zî vecena erzena binê serradî, reyna aw kena ci, heta yena nîmey rayî, serradî cay reyna bera venge.

Nişka ve ra kono vîrê cay, vana "Şak pîlanêke ro min nêvirazo?" Yena keye, hanêna ci baniyo! Şakî birxul heme veradawo 'erd, firaqî berdê, şîyo. Pire pey ra kona ra Şakî dim a, ha tiya ha haca heta nizdikî ro ci kena, Şak kono ra we verê Çemê Ad û Toban. Pire vana:

-De şo! Welle ti xelesiy. Min ad kerdo, ez nêkona ra we verê Çemê Ad û Toban.

Şak firaqanê zêrrînan beno dano Padişay. Narê Padişay vano:

-Ti go şorî Pire zî biyare!

Şak vano: -Eman, yeman! Pire merdimwer a, ez o şeyîn şinê Pire biyari?

Padişay vano: -Ya ti go biyare yanî ez o serey to tera bikerî.

Şak hanêno mecale çinya, ya go Pire biyaro yan zî serey cê tera beno. Vano:

-Madem ku ana wa şima go mi rî kils û hecer ra caykew mezbut virazî, hewt beryanê (3) hasinînan pero dê, pey hewt beryanê hesinînan de

çalêka kûr adê (4), cay min zî wetê çale de virazê ku Pire nêşko bêro min boro. Mi rê postey hebêke beranê hewt birînî biyârû hergû müy wa zengilêke giye dê, ez o xu ra dî û şinî.

Anê beranêkew hewt birîne sere birnenê, postê cê tera kenê, kenê wişk, virazenê, hedernê, hergû müy cê wa zengilêke giye danê. Şak dano xu ra û bişewe şino serê banê Pire. Şino verê locine, gurm gurm xu dano 'erd ro û şano tê, zengili vanê "zing zing". Pire ven dena vana:

-Ew kam o banê mi ser o gur-gur û zing-zing keno?

Şak vano: -Ez Azrahîl a, Azrafîl a! Ez rihe Pire gîna.

Pire vana: -Ez xu çâ kerî ti rihe min nêgîre?

Şak vano: -Ti bikoy zerey hebêke dolabe, resenêke ser o rûnê, berya ro xu kilît kena û kilîtî verê berya ro erzena teber.

Pire ana resenêke serê dolabe de nana ro û kona zerey dolabe, berya ro xu kilît kena û kilîtî verê berya ro erzena teber.

Şak yeno war, paşte keno dolabe ver û yella. Ano serê Pîrdê Ad û Toban ro derbas keno (vîrnenro ra), vana:

Şak vano: -Dada Pîri, ti zana enka ma çâ y? .

Pire vana: -Nêza.

Şak vano: -Enka ma kewti we verê Çemê Ad û Toban.

Pire vana: -Şako, min sond wendbî, ez nêkewtê we verê Çemê Ad û Toban.

Şak vano: -Çîke nêbeno dada Pîri.

Şak Pire beno verê koşa Padişay de nano ro. Şarê bajarı heme ewca kom bîyê, vanê "gelo Pîra merdim-were seyîn a?"

Şak vano: -Şima beryay cay nêkerê a, heta ez şinî bikoy pey hewt beryanê hasinînan.

Padişay vano: -Nê ti serbest be, şo heta ti nêresê cay xu ma berya nêkenê a.

Şak şinô kono pey hewt beryan, dimay xu beryan kilît keno û şino wetê çale; tîr û kevanê xu gêno, vindeno.

Padişay emir dano vano: -Beryay dolabe akerî, Pire vera dâ teber!

Seyîn Pire vera danê teber, Pire kona miyanê ê nefrî'amî, hemînan wena, bajar kena kor, firo tede nêmanena. Tenî hebêke pisînge manena. Pire pirray (za'f) a pisînge zivirnena (çarnena), kena nêkena hewa pa niyana (5). Pisînge zî tir nefeso bera Pire zî hendi xu ra kona. Pisînge Pire ra vana:

-Ez cay Şakî to mocnî ti min nêwena?

Pire vana: -Ti cay Şakî min moc-

nê ez to nêwena.

Pisînge bera verê beryanê hasinînan, vana:

-Şak na yo etiya pey hewt beryanê hasinînan de wo.

Pire ay zî gêna zey eşkice erzena rîverî û ven dena Şakî, vana:

## Pêşangeha kitêbên Kurdî

Bi alîkariya kitêbxana "Xanî" û Partiya YEKÎTÎ a Demokrata Kurd, di 10.05.1994'an de li Helebê pêşengeha kitêbên Kurdî ya duduyan hate vekirin. Gelek rewşenbir û welatparêzên Kurd besdari vekirina pêşengehê bûn.

Pêşengehê çar rojan dewam kir û li gel hin kêmasyan ji, ji alî kitêb û mîvanan ve dewlemend bû. Di pêşengehê de bêyî kitêban, gelek kovar û rojnameyên Kurdî ji cî girtibûn. Wek tête zanîn ev cara duduyan e ku li Kurdistana Rojava tiştîkî wilo çedibe. Ev ji ciyê pesin û rîzdariyê ye.

Kamiran Bêkes/ Efrîn

## Ji Malbatên Kurd re

Dersêz zimanê Kurdi

Ziman bingehê hebûna gelan e. Gelan ku zimanê xwe wenda kiribin, di demek kin de bi xwe ji wenda dibin.

**Kurdino!**

Bi Kurdi hîn bibin û hîn bikin!

Bi Kurdi bixwînin û binivisin

Kurdîn li Almanyayê

Dersêz zimanê Kurdi di 27'ê Nisanê de, di dibistanen li jêr nav û nîşanen wan hatine nîvisandinê de dest pê kirine. Malbatên ku dixwazin zarokên xwe qeyd bikin, dikarin di roj û seetên li jêr hatine nîvisandinê de

bîçin van dibistanan û zarokên xwe qeyd bikin.

Nav û navniganen dibistanan:

**Bergedorf:** Grundschule Nettelburg, Fiddingeshagen 11,

Roj: Sêsem û Pêneşem

Seet: 14.30-17.00

**Mamoste:** Giyasettin Yıldız

**Neugraben:** Frida-Stoppenbrink-Schule, Neuwiedenthalerstr. 4

Roj: Sêsem, Çarşem

Seet: 14.30-17.00

**Mamoste:** A. Hakim Gulsen

**Wilhelmsburg:** Willi Kraft Schule, Zeitlerstr.

**Mamoste:** Giyasettin Yıldız

(Roj û seet wê dawî bê destnisan kirin)

**Wandbek-Hohenhorst:** Schule CharlottenburgerCharlottenburgerStr.

Roj: Sêsem, Pêneşem

Seet: 14.30-17.00

**Altona:** Schule Thaden Thadenstr. 147

Roj: Desem, Pêneşem

Seet: 14.30-17.00

**Mamoste:** Ali Koyluce

**Eidelstedt:** Shule Fuhrtweg, Fuhrtweg, 56

**Mamoste:** Ali Koyluce

(Roj û seet wê dawî bê dest nîşan kirin)

**Harburg:** Gesamtschule Harburg,

**Mamoste:** Ferahnaz Ozevin

(Roj û seet wê dawî bê dest nîşan kirin)

## HEVKAR-Almanya

## Konferansa yekem ya Federasyonê

Federasyona Komeleyê Kurdistanê li Swêdê, Konferansa xwe ya yekem di 28-29-ê Gulanê de li "Runö" yê civand. Wek tê zanîn, Federasyona Komeleyê Kurdistanê di Kongreya xwe ya 13-hem de, di warê maweya civandina kongreyê xwe de, di destûra Federasyonê hinek guhertin kir. Li gor vê guhertinê; Kongreyê Federasyonê dê ji du salan carekê bê civandin û dê di navbera du kongreyan de ji konferansek bê civandin. Federasyon Li gel endamên Komîteya Karger, Komîteya Giştî yê Federasyonê û Komîteyên Karger yê Yekîtiya Ciwanê Kurd li Swêdê û Yekîtiya Jinê Kurdistanê li Swêdê, Serok, sekreter û sekreterê mali yê komeleyên endam besdari vê konferansê bûn. Ji herçar perçeyên Kurdistanê, hemû hêzên Kurd û Kurdistanî ji hatibûn dawetkirin.

Di konferansê de xebata Federasyonê ya salekê ku ji aliyê sekreterê Federasyonê Mustafa Aydogan ve bi nîşkî hatibû amadekirin, hat munaqşekirin û nirxandin. Rapora malî ya ji aliyê sekreterê Malî Ahmed Karamus ve hatibû amadekirin, li gel rapora Komîsyona Lîkolînê hat pêşkêşkirin. Li ser sedemên deynê Federasyonê û rîyên baştirkirina aboriya Federasyonê, munaqşeyen erîni hatin kirin. Di konferansê de li ser rewşa Berbangê ji hat rawestandin û ji bo berbunga pêş, munaqşeyen rînîşander hatin kirin. Ji dervayî pêşkêşkirina xebatên navendi, gelek komeleyên endam ji bi rîya berpirsiyaren xwe ve, xebatên xwe pêşkêşî besdareñ konferansê kirin.

Konferans bi gelek pêşniyar û bîryaran ve qedîya. Hinek ji wan bîryaran ev bûn: 1- Li ser navê Konferansa yekem ya Federasyona Komeleyê Kurdistanê li Swêdê, ji bo rawestandina şer û parastina neteweyî ya li Başûrê Kurdistanê, ji Hukûmet, Parlamento û serkidayetiya herdu hêzên sereke yê Başûrê Kurdistanê re nameyek tê şandin.

2- Federasyon ji bo bîdestxistina mafê radyoyekê ku li seranserê Swêdê lê bê guhdar-kirin, dest bi civandina imzeyan dike.

## Dûmahîka nîvîsan

### Ma êdî birakuji....

nîşan dan û di nameyê de tête gotin ku; "em bangî hukûmeta Herêma Kurdistanê dikin ku berjewendiyê neteweyê Kurd li pêş hemû tişî bigrin û ji bo rawestandina şerê birakujiye in-siyatifa xwe bigrin."

Hersê hêzên Kurdistana Bakur YEKBÛN, RNK, TSK ku bi hev re bîryara avakirina yekîtiya siyasi girtibûn li ser şerê birakujiye ji raya giştî re beyaneke derxistin. Di beyanê de wiha tê gotin; "...Weke her civatê, di civata kurd de ji gelek pirs û pisgirêk hene û wê hergav pirsên nû ji derkevin holê. Destavê-tina çekan di tu demê de nebüye dermanê çareserkerina pirsên weha. "Şerê Birakujiye" di tu demê de pirs û pisgirêkên civatî û siyasi yê gelê kurd çareser nekiriye û her gav birînen nû di canê gelê kurd de ve-kirine."

"...Divê pirs û pisgirêk hene bi awa û metodên aşîti çareser bibin. Ji bo kulturek weha di nav civat û rîxistinê me de geş û xurtur bibe, diyar e ku hîn gelek vatiniyê taybeti dik-

evin ser milêne me.

Divê di şerî de hêzên siyasi yê Kurdistana Başûr rez û hurmesta Hukûmeta Federe ya Kurdistanê bigrin û çareserkerina pirs û pisgirêkên civatê bispêrin Hukûmetê û muesesên wê. Di birêvebirina Kurdistana Başûr de, divê bi rasî hemû selahiyet û desthilâfi de stêr Hukûmeta Federe ya Kurdistanê de bin."

11 hêzên Kurdistanê li ser axa rizgarkirî komiteyek avakirin û ji bo şer rawestandina şer bi herdu terefan re guftugo çêkirin.

Li Hewlêrê 33 hezar imze hatin civandin û jînên Kurd ji bo şer bisikine Parlamentoyê "îsgal" kirin.

Serokê Federasyona Komeleyê Kurdistanê li Swêdê Vîldan Tanrikulu ji serokê Parlamentoya Herêma Kurdistanê Cewher Namik Salim û Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Abdullah Resûl re nameyek muşte-rek şand. Di nameyê de tête gotin ku; "Ev şerê birakuji ku di navbera herdu hêzên mezin de li ser axa rizgarkirî derkeviye xemginiyeke mezin xistiye dilê Kurdê

Swêdê."

Lê sed mixabin ku hewildanê hêzên Kurdan di navbera Partî û Yekîtiyê de nefice neda. Hêwildana INC (Kongreya Neteweyî ya Iraqê) şiddeta şerê birakuji kêm kir, lê ranewestand. Li gor nûcuyan dewleta Tirkîye wê di navbera Kak Mesûd û Mam Celal de navbenitye bike. Serokê Kurdan vê pêşniyara Tirkîye qebûl kirine û li Silopiye wê civîn çêkin. Ma ev ji bo Kurdan ne rûresi ye?

Ev şerê birakujiye nişan dide ku herdu hêzên ku hukûmetê ava kirine û dewleta federe ilan kirine, hin tahmûlê hev nakin, guh nadîn gelê Kurd û hêzên wê, û her kes bi sérê xwe fermandar e.

Wexta rojnama me ket çapê Serokê Yekîtiyê Celal Talabanî û endamê Buroya Politik ya PDK-Yekîrtin Fadil Mutnî li Silopiye di bin çavdariya Tirkîye de hatin ba hav û guftogo kirin. Lê pişti guftogoyan ji şerê navbera herdu partîyan dom dikir.

Li gor beyana YNK ya rîxistina Derve ku di 30 Gulanê de belav bûye ev kesen ku navên wan li jêr hatine nîvisandin di şerê birakujiye de hatine kuştin:

Nav	cî	tarîx
Hesen Kuwestanî(endamê Serkidayetiya YNK)	Heciumran	17.5.94
Mahmûd Kuwestanî (birayê H. Kuwestanî)	"	"
Yusif( Pismamê H. Kuwestanî)	"	"
Rêbaz(Rifat Abdulah) Berpirsiyare eskerî	Berderes	8.5.94
Selam Salih (Pêşmerge)	Akre	8.5.94
Ferhat Hemê Emin(Pêşmerge)	"	"
Cewher Teha (Pêşmerge)	Berderes	22.5.94
Musîn Mahmud (Pêşmerge)	Selehedin	5.5.94
Ferhad Misfeta (pêşmerge)	"	"
Rizgar Osman(Pêşmerge)	"	"
Behzad Mehemed Elizade(Pêşmerge)	"	"
Muxlîs Xefûr (Pêşmerge)	"	"
Ehmed Qadir (polis)	"	"
Ebdullah Ehmed (Pêşmerge)	Akre	7.5.94

Li gor beyana Buroya Politik ya PDK-Yekîrtin ku di 24.05.1994'an de hatiye belavkirin, kuştîyên Partiyê ev in:

Şerwan Ebdulerim(Şerwanê Sor), Mam Yehya(Helgore), Osman Omer, Karûx Osman Omer, Aso Osman Omer, Hiwêz Hesen Reşê(Hiwêz Rêşê)

## Kitêbek nû:

**Malmîsanij;** Cizira Botanlı Bedirhaniler ve Bedirhanî Ailesi Derneği'nin Tutanakları (Bedirhanîyên Cizîra Botan û Deftera Komela Malbata Bedirhanîyân), Weşanxaneya APEC, 1994, Stockholm, bi Tirkî.

Kitêb bi Tirkî ye. Di destpêkê de nîvîkar bi dûr û direjî li ser malbata Bedirhanîyân û Bedirhan Beg bi xwe disekine. Piştre li ser 44 Bedirhanîyân navdar radiweste. Her weha beşek ji kitêbê li ser defterke Komela Malbata Bedirhanîyân e ku di 1920'l de bi dest hatiye nîvisin. Di dawîya kitêbê de wek paşko cih daye hîn nîvisen A. Cewdet, K. Alfı Bedirhan, Suleyman Nazîf, A. von Molteke û hwd. Kitêb bi taybeti ji bo kesen ku bixwazin li ser tarixa siyasi ya Kurdan a sedsala 18 û 19 bixebeitin gelek bi kêt tê. Di kitêbê de her weha gelek foto û belgeyên kevn ji hatine çapkirin.

Malmîsanij

CIZİRA BOTANLI  
BEDİRHANİLER  
BEDİRHANİ AİLESİ  
DERNEĞİNİN TUTANAKLARI

